

Li dijî Med-TV şerê teknolojîk: Tirkiye li fezayê jî derket nêçîra

Tirkiye, tevî agirbesta yekalî ya PKK'ê, zora raya gişî ya cîhanê vê dawiyê bêhtir şerperestiyê dike û berê xwe dide saziyên kurdan. Pêşîn bo weşanên MED-TV'ye sinyal hatin şandin û peyre bi biryara Walitiya OHAL'ê belavkirina Azadiya Welat li hin bajarên Kurdistanê hate qedexekirin. Derdorêñ welatparêz van êrîşan wekî dirêjiya "konsepta marjînalkirinê" dibînin. (R.8-9)



Ji Dûmaya Rûsyayê nirxandina krîzê:

Tirkiye bi êgîr dilîze



Êrîşen dewleta tirk ên li ser gelekê kurd û cîranêñ xwe riya li ser navneteweyîbûna kêşeya kurd firehtir dike. Çalakiyên ku di qada navneteweyî de pêk têñ vê rastiyê nîşan didin. Roja 8'ê kewçêre li Rûsyayê û Roja 10'ê mehê jî li Belçikayê du çalakiyên girîng pêk hatin. Şexsiyetên girîng ên kurd û biyan beşdarî di van çalakiyan de kir. Di van çalakiyan helwesta dewleta tirk a şerperest hate şermezarkirin û hate xwestin ku dewlet cîhanê pî bidin ser Tirkîyeyê da ku dev ji şerdxwaziyê berde û were ser riya çareseriyyê. (R. 3)

Şehîd-Bîranîn: Gerîla Fevzi Önal

Wêje: Ü me mirin dereng hişt

Nûçe: Li Frankfûrtê deryaya pirtûkan

Şîrove: Homê homan û kerdenê dewleta tirk

- Rûpel 6

- Rûpel 10

- Rûpel 16


- Rûpel 15

Mahmut Kılınç: Erîşa li ser Sûriyeyê r.5

Lerzan Jandîl: Ez diz a ha ! r.11

Osman Özçelik: Kongreya mezin a HADEP'ê r.13

Serkan Brûsk: Dermanê wan bersiva agirbestê ye r.7



SAMİ TAN

Lê ev tişt nikarin li ber
geşedana Tevgera Azadiyê
bibin asteng. Gelê kurd bir-
yara nivîsîna çarenûsa xwe
daye, tu hêz nikare li ber vê
daxwaza gelê kurd bibe
asteng.

Dewleta tirk li hemberî medya kurd şer îlan kir

Mirov dikare bibêje, dewleta tirk hefteya çûyî wekî "hefteya şerê bi medya kurd re" diyar kiriye. Xuya ye ku biryara vê yekê di civînên MGK'ê de hatiye girtin. Vî şerî şeva 9'ê mehê bi destpêkirina bernameya "Panel" li ber MED-TV dest pê kir. Ji nişka ve weşan qut bû. Hewlê bo ji nû ve destpêkirina weşanê bi ser neketin.

Di heman demê de sansûra li ser Rojnameya Ülkede Gündemê zêdetir bû, bi taybetî nûçeyen têkildarî êrîşen li ser MED-TV hatin sansûrkirin. Êrîşa dawîn jî li ser rojnameya me pêk hat.

Roja 13'ê kewçêre hevalê me yê Amedê agahdarnameyek ragihand me. Li gorî vê belgeyê, rojnameya me li Herêma Rêveberiya Ne-asayî bi biryara waliyê herêmê hatiye qedexekirin. Li hemberî vê biryara li dûrî pîvanê mafêni mirovan û mafê agahdarbûnê me xwest bi civîneke çapemeniyê dengê

xwe bigihînin raya giştî. Lê mixabin çapemeniya tirk û navneteweyî besdarî civîna çapemeniyê nebû. Tê zanîn ku çapemeniya tirk li gorî biryara MGK'ê tevdigere. Her wekî rojnameger Ragip Duran dibêje, kesen ku di rojname û televîzyonê tîrkan de dixebitin ji bo ku rojnamegeriyê nekin, pere distîn.

Lê me ji helwesta çapemeniya navneteweyî tiştek fêm nekir. Gelo ew ji li gorî daxwaza MGK'ê tevdigerin? Li hemberî helwesta çapemeniya navneteweyî jî gotinê Nicol Pope hatin bîra me, wê di forûma bo pîrozkirina sedsaliya rojnamegeriya kurdî de gotibû: "Edî nûçeyen li ser şerê li Kurdistanê hêjayî weşandinê nayen dîtin." Em hêvî dikin ku ew helwest biguhere. Helwesta wan jî dê di rojê pêş de diyartir bibe.

Mebesta rayedarên dewleta tirk li holê ye. Ew dixwazin Kurdistanê veg-uhêrin girtigeheke sergirtî da ku gel bi

tu awayî nikaribe dengê xwe bigihîne raya giştî ya cîhanê. Pêşî İHD û NÇM hatin girtin, Ülkede Gündem hate astengkirin, niha jî dewletê li hemberî MED-TV dest bi şerê teknolojik kiriye û Azadiya Welat hatiye qedexekirin.

Lê ev tişt nikarin li ber gesedana Tevgera Azadiyê bibin asteng. Gelê kurd biryara nivîsîna çarenûsa xwe daye, tu hêz nikare li ber vê daxwaza gelê kurd bibe asteng. Ji vê helwesta tund dê doza aşî u biratiyê xesarê bibîne. Li hemberî agîrbesta yekalî êrîşen tund bi xwe re bûyerêne wekî ya Wanê tînin. Heke hêzên dewletê dev ji tevgeren ji bo qirkirina gerîla bernedin, ew dê jî bersivê bidin wan û dê bi dehan ciwanen kurd û tirk ji jiyanâ xwe jî dest bidin.

Giregirên dewletê ji vî şerî xesarê nabînin, kesen ku tênu kuştin kedkar in, nexwe divê ew li hemberî van êrîşan hişyar bin û piştevaniya gelê kurd bikin.

"Pergala Cîhanê ya Nû" û hêza medyayê

V.AYDIN-E.YÖRÜK

Dema ku em tê de ne, di bin rîberiya Dewleten Yekbûyî yê Amerikayê de, gel beremberî êrîşike nû ne. Ev êrîşa bi navê Pergala Cîhanê ya Nû (PCN), êrîşike dijwar û piralî ye. PCN bi gelek sazî û navgînan êrîşan dibe ser gelan. Medya jî yek ji van saziya ne. Medya, bi pêvajoya PCN'ê re hil-kişîya cî û merheleyeke nû, li ser her tişti hêzeke medyayî hate afirandin. Ev hêz jî, ji mêjî û dilê mirovan bigire hetta mal bi mal, zere bi zere xwe bera her derê da û cihêkî bingehîn girt.

Medya, berî her tişti amûreke hegemonyê ya ideolojik e. Seranser fikir û ramanen kesan dike bin bandora xwe. Mirovan dike dîlê "Nîzamê" û ji bo PCN'ê mêjîyê mirovatiyê radipêce. Hemû, tez, doktrîn û stratejiyên PCN'ê bi riya medyayê bi civakan di din pejirandin. Medya pesnê PCN'ê dide, şerîn rizgariya gelan wekî terorist bi nav dike û imperializmê wekî mirovhez nîşan dide. Bi vî awayî medya, mîna navgîna propagandaya esasî ya "Globalizmê" tê bikaranîn.

Mînaka herî berbiçav di Şerê Kendavê de derkete holê. Bi riya medyayê propagandaya mafdarbûna DYAY'ê hate kîrin. Lê tê zanîn ku DYAY'ê Sêdam afirand û kire belaya serê gelen Rojhilata Navîn. Ev rastî bi saya med-

yayê hate veşartin û bincikirin. Dîsa bi dagirkirina Somaliyê re jî ev tişt hate dîtin. CNN'a ku dagirkirina Somaliyê bi zindî weşand, kete hewldana rawekirina DYAY'ê. Beriya ku piyadeyên DYAY'ê Somaliyê dagir bikin, CNN'ê ew der dagir kir...

Wezifeyeke bingehîn a medyayê jî, afirandina mirovîn "Pergala Global" e. Jiyana mirovan; ji aliye konevanî, civakî, çandî û hwd. ve bi riya

Medya, berî her tişti amûreke hegemonyê ya ideolojik e. Seranser fikir û ramanen kesan dike bin bandora xwe. Mirovan dike dîlê "Nîzamê" û ji bo PCN'ê mêjîyê mirovatiyê radipêce.

medyayê tê drûvandin. Her dike mirov ji civakê dûr dikevin û dîbin dîlê medyayê. Mirov xwe di tenêbûneke kûr de winda dîkin. Ji her alî ve kesa-yetiyyen pûc, ji nirxên xwe yê esasî dûrketî têni afirandin. Medya; bi torêne xwe yê ragihandinê hemû dinê radipêce. "Çanda Global" li her aliye dinê belav dike. Lê di rastiyê de ne belavkirina çandê ye, rapêçandin e. Ji xwarinê heta lixwekirin, ji muzikê heta sporê ya ku tercîhen mirovan manipule dike dîsa medya ye.

Medya ji her hêlê ve hewl dide ku civakêن berxwir (tüketicî) biafirine.

Ev bo împerializmê ferz e. Lewre ji bilî vê, pergala împerialist ji aliye aborî ve nikare li ser lingan bimîne. Ji robotan wêdetir, heywantî û ketinek mezin heye. Taybetiya ku mirov û se-walan ji hev cuda dike, keda mirova bi hiş e û zanebûn e. Mirovên ku ji xwarin û lixwekirin pê ve tiştekî nîzanibin, ew hatine şenîka heywantiyê. Ev ne peyveke erzan û ne ji heqaret e. Medya, bi bandora xwe ya rûxîner vê hêzê roj bi roj dikuje. Di jiyana pratîk de mirovê ku ji ramana xwe dûrketî, mirovê bê vîn û bê hîs diafîrîne. Bikaranîna peyva "heywantiyê" jî, ji ber vê ye.

Di dema me de, medyayê pawana ragihandin û enfor-masyonê xistiye bin destê xwe. Nûcê û şiroveyen ku digihêjînin gel, bialî ne û di parzûnê medyayê re derbas dîbin. Ger ew nexwazin, bûyereke heri girîng jî nayê belavkirin. Tekelên medyayê edî sînorê neteweyî dibihu-rin û di qada navnetewî de bi ristêne mezin radibin.

Li tevayê dinê mirovên xizan û bindest, her dike xizan dîbin, lê dîsa ji medya cîhanêke xeyalî çedîke û dix-waze gelan bixapîne. Mirov û gelên ku bûne dîlê wê dinê, edî ji ber-jewendiyen xwe yê bingehîn qetiyane û birêvebirina wan pir hêsan e. Pişî van taybetiyê medyayê, rola wê jî di "Pergala Global" de baştir tê famkîrin. Rola ku "Pergala Global" li medyayê bar kiriye ev e.

Ferhengok

amûr: navgin (araç)	kedi: evcil
ardu: yakacak	kitekit: ayrıntı
arîse: pirsgirêk	keşî: gemi
alîf: êmê sewalan	mîsoger: teqezi (garanti)
bîncîlîkîn: veşartin	nîmandîn: temsîlkirin
bîdîdî: bîedaletî	nâsnâv: kimlik
berxwedîr: asî, direnişçi	pawân: tekel
boçûn: dîtin	parêzgeh: cihê ibadetê
bêşîsandîn: bişîrin	pêşbaz: yarışmacı
berxwîfî: berxercî (tüketim)	pereng: köz
çavên xewokî: uyku-lu göz	parzinandîn: dawerandin, süzmek
dirûvandin: dirûv dayîn	rûxîner: texribkar
diyarker: belirleyici	rûpûş: maske
çespandin: tespitkirin	rîj: komir
erdînîgarî: cografya	sîwan: şemsîye
guhîr: şevîn	ravekirin: terîfîkirin
guncan: müsait, kap-asite	şibake: pace
hoker: dilbilgisinde zarf	şayan dîtin: hêja dîtin
jîzweber: otomatik kendav	sîvîle: şiverê (patika)
karesat: felaket kîswîr	tora ragîhandinê: enformasyon ağı
kîswîr: iklim	veciniqîn: pertafkirin (irkilmek)
	zayend: cinsiyet

Ji dûmaya Rûsyayê nirxandina kirîzê: Dewlet bi êgir dilîze

Endamê Komîteya Navendî yê Partiya Komûnîst û Parlementer Yûrî Nikoforenko: "Bi hezaran gundêñ kurdan hatine şewitandin, mirovîn kurd hatine kuştin. Divê em kêşeya kurd bibin rojeva Neteweyêñ Yekbûyi, binbariya me ye ku em çavêñ xwe ji evkujiya ku li gelê kurd tê kirin re negirin."

Dengvedana agirbesta ku Serokê Giştî yê PKK'ê diyar kiriye, digel hemû êrîşen rayedarên ewleta tirk ên li ser tevgera kurd û ewletêñ ciran, didome. Krîza ku di avbera Sûriye û Tirkîyeyê de ji ber elwesta tûj a rayedarên dewleta tirk û hat, reaksiyona li hemberî vê dewletê zêdetir kir û bo navneteweyibûna şeşa kurdi rewş guncantir kir. Hefte-a çûyî du çalakiyêñ ku vê rastiyê nîşan idin pêk hatin. Çalakiya yekemîn roja 'ê kewçêra 1998'an li Dûmaya Rûsyayê bi besdariya siyasetmedarêñ Rûsyayê û Nûnerê ERNK'ê Mahir Welat û hat. Çalakiya duyemîn ji roja 10'ê ewçêre li bajarê Belçika Leuvenê pêk at. Di vê çalakiyê de ji digel rewşenbîr siyasetmedarêñ kurd, şexsiyetêñ navar ên navneteweyî ji besdarî kirin, çaseseriya kêşeya kurd bi rîbazêñ siyasiyat xwestin.

Aleksî Mîtrofonov: Bingeha krîzê kêşeya kurd e

Serokê Komîteya Jeopolitîk a Dûnaya Rûsyayê Aleksî Mîtrofonov da zanîn ku di bingeha krîza Tirkîyê û Sûriyeyê de kêşeya kurd heye û wiha got: "Zer çiqas Tirkîyê li derive li çareseriya teşeşa xwe ya hundîrîn bigere ji, di bingeha krîzê de kêşeya kurd e. Em wekî Komîteya Jeopolitîk nahêlin tu Tirkîyê aloziyete wiha çêkirî bi-sifirîne. Em alîşirê vê yekê ne cu qeyrana iavbera her du lewletan bi iyêñ diplonatîk çareker bibe."

D i
i -


vînê di Berpirsê ERNK'ê yê Civata Dewletêñ Serbixwe Mahir Welat ji besdarî kir û boçûnêñ kurdan ên li ser rewşa herêmê anîn zimêñ. Welat krîza di navbera Tirkîyê û Sûriyeyê de bi berjewendiyêñ stratejîk ên DYAY'ê ve girêda û diyar kir ku Amerîka dixwaze bi metodêñ cur bi cur Rojhilata Navîn, Balkan û Kafkasân bigire bin bandora xwe. Berpirsê ERNK'ê Welat, bal kisand ser vê rastiyê ku DYAY di vî warî de Sûriyeyê li ber stratejiya xwe kelem dibîne û lewre ji Tirkîyeyê bi ser wê dewletê de dişine. Wî got: "Heke kêşeya kurd nebûya ji dê DYAY û Komara Tirk bo şerê bi Sûriyeyê re sedemek bidozandana."

Mahir Welat da xuyakirin ku polîtîkaya DYAY û Ingilistanê li herêmê top avêtiye, tu daxwazêñ wan pêk nehatine, ew dewlet şoreşa Kurdistanê li ber armanca xwe wekî asteng dibînin, lewre ji çavêñ xwe ji şewitandin bi hezaran gundêñ kurdan û kuştina bi deh hezaran mirovan re girtin.

Berpirsê ERNK'ê agirbesta ku PKK'ê ilan kiriye û helwesta neyin ya Komara Tirk bi bîr xist û da zanîn ku dewleta tirk ji bo bincikirina arişeyen navxweyî bi cîranêñ xwe re krîzan derdixe. Di dawiya axaftina xwe de Mahir

Welat daxuyand ku dê ji her kesî zêdetir Rûsyâ ji şerê di navbera Tirkîyê û Sûriyeyê zirarê bibîne û wiha got: "Rast e, Rûsyâ naxwaze bi Tirkîyeyê re têkiliyêñ xwe yêñ aborî xera bike, lê ev dewlet Rûsyayê dişêlinne. Li aliyê din em aşıtyê dixwazin, lê Tirkîyê ji rîbazêñ aşıtyane fêm nake, em ji amade ne ku bersivê bi rîbazêñ ku ew jê fêm dike bidin wê."

Di civîna çapemeniyê de Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Komûnîst û Parlementer Yûrî Nikoforenko ji axaftinekir. Nikoforenko bi gotinîn "Tirkîyê bûye polîsa herêmê" dest bi axaftina xwe kir. Piştre ji bi bîr xist ku Tirkîyê di şerê sar de rûpûsa hêzen NATO'yê bû. Nikoforenko krîza navborî wiha nirxand: "Heke Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan li Sûriyeyê bimîne ji,



Mahir Welat

ev nabe sedema şer. Bi hezaran gundêñ kurdan hatine şewitandin, mirovîn kurd hatine kuştin. DYAY bi leşkerêñ NATO'yê ku der bikeve ber êrîşî wir dike, em nikarin li hemberî vê yekê bêdeng bimînin. Divê em kêşeya kurd bibin rojeva Neteweyêñ Yekbûyi, binbariya me ye ku em li hemberî tevkuijiya ku li ser gelê kurd pêk tê bêdeng nemînin."

Danielle Mitterrand: PKK artêşa berxwedanê ye

Pişti vê çalakiya girîng bi du rojan, îcar li bajarê Belçika Leuvenê ji hêla İnstîtuya Brukselê ve konferanse hataldarxistin. Gelek siyasetmedar û şexsiyetîñ kurd û biyan di vê konferansê de besdarî kir. Ji partiyêñ kurdan PKK, YNK, PDK-î, PSK di konferansê de boçûnêñ xwe derbirin. PDK'ê her çiqas pêşî bo besdarbûnê bersiveke erêni da ji, piştre re ji besdarbûnê xwe da alî. Li ser navê PKK'ê Kani Yılmaz di konferansê de amade bû. Yılmaz da zanîn ku dewleta tirk bi van kîrinê xwe agirbestê dixe xetereyê. Kani Yılmaz diyar kir ku agirbest ji wan hatiye xwestin. Li ser Başûr ji wî got: "Heke hêzên başûrî dest nevêjin hînek listikîn erzan, em dê berevaniya Dewleta Federe ya li başûrê Kurdistanê bikin. Nûnerêñ partiyêñ kurd li ser çareseriye bîr û ramanêñ xwe anîn zimêñ û ho çareseriye pêwîstîya hevgirtina kurdan anîn zimêñ."

Siyasetmedarêñ Belçikî Fons Bor-

gignon (Partiya Yekîtiya Gel), Lode Van Oost (Agalev), Geert Versnick (VLD), Ann Van Lancker (SP), Suzatte Verhoeven (CVP) û Chris Den Hond (SAP) di konferansê de axivîn. Siyasetmedarê Belçikî xwest ku ji bo çareseriya kêşeya kurd ambargoja çekan ji di nav de, bi rîbazêñ cur bi cur zorê bidin dewleta tirk. Her wiha wan xwest ku dewletêñ ewrûpî dev ji polîtîkayêñ durûberdin.

Di dawiya konferansê de Seroka Weqfa Azadiyê û jîna Serokê Fransayê yê berê François Mitterrand, Daniella Mitterrand axaftineke balkêş kir. Mitterrand da zanîn ku ji bo çareseriya kêşeya kurd û avabûna dewleteke kurdî merc guncan dibin. Piştre ji wê bi van hevokan boçûnêñ xwe anîn zimêñ: "Li bakurê Iraqê tiştekî baş pêk hat. Her du rîexistinêñ kurd li Amerîkayê li hev hatin. PKK'ê li hemberî dewleta tirk agirbest ilan kir, piştre ji li PDK'ê banga agirbestê kir. Ev gişt nîşaneyêñ amadebûna bingeha dewleta kurdî ne. Ez bi xwe ji berxwedêreke berê me, ji ber vê yekê berî niha bi salan min gotibû: 'PKK artêşa berxwedanê ya gelê kurd e.', niha ez geleki setbilind im ku ev ditina min hatiye çespandin. Bêdadiya heftî mezin neheqiya ku li gelê kurd tê kirin e. Biryareke ku mafê azadî û nasnavê gelê kurd li wî vegerîne pêwist e. Di vî warî de divê em zorê bidin ewrûpiyan."

Nimûneyekî dewlemendiya zimanê kurd-

Nav û nîşanên sewalêن kedîkir

Di civaka komûnal de mirovan debara xwe bi taybeti bi nêçirvanî û berhevkirina gihayan kiriye. Ji bo ku xwe ji karesatén surîşî biparêzin, pêdiviyêن xwe yên weki; xwarin, bicihbûn, lixwekirin û paras-tinê bi awayekî genc bi cih bînin mirovan pêwîstiya bi hev re jiyînê dîtiye. Ev yek bûye destpêka pêkhatina jiyana ci-vakî. Bi jiyana civakî re di jiyana mirovan de gelek tişt guherîne.

Di dîroka mirovahîyê de şaristaniyê bi çandiné û sewal kedîkirinê dest pê kiriye. Mirovan di encama berhevkirina tovîn giha û fêkiyan de dest bi çandîniyê kiriye. Her wiha di encama kedîkirina sewalêن kovî de jî dest bi xwedîkirina sewalan kiriye. Roja îroyîn jî di nav gelê kurd de peyvîn weki; pezkovî, bizinkovî, gakovî hwd. derbas dîbin. Ev yek jî baş diyar dike ku hemcînê van sewalêن kedî yên kovî (çiyayî) li Kurdistanê jiyane an jî hîn jî dijin.

Kurdistan bi erdnîgarî û kîşwera (iklim) xwe ji bo giyanberan ji desipêkê hetanî roja me bûye cih û warê jiyane. Lewre jî li gorî dîroknas û lêkolineran kedîkirina sewalan, çandinî, çêkirina bajaran her wiha kedîkirina hespan cara pêşin li Kurdistan (Mezopotamya) ê dest pê kiriye. Di encama pîrbûna çeregeh, zozan, çem û kaniyan de li Kurdistanê xwedîkirina sewalan û çandîni zor bi pêş ketî ye.

Di vê nivîsê de nemaze em ê li ser taybetiyêن sewalêن kedîkirî rawestin.

Li gorî reng, dirûv, za-yend û temen, taybe-tiyêن sewalêن kedîkirî

Di zimanê kurdî de bi kitekitî têgîn û peyvîn ku beramberî xweserî û taybetiyêن sewalêن kedîkirî dimînîn, hene. Kesên ku mantalîteya zimanê kurdî baş fêm nekin dê mîsoger leqayî aloziyan bêñ. Çimkî di navbera van taybetiyêن sewalan de cudahiyêن pir kûr û berbiçav tune ne. Lewma jî têgînîn ku wan diyar dikin mimkûn e ku tevlihev bibin. Me ev lêkolîna xwe bi piranî li do-ra herêma Serhedê kir. Ji bér ku me bi herêmekê sînorand dibe ku hin kêmâsi rû bidin.

hesp
li gorî zayend û temenê wan
hesp (nêr)
mihîn (mê)
canî (mê)
kurîk (canyî nêr)
bargir (bergîr) hespên ku bi taybeti bo barkirinê têne xwedîkirin.

parone: hespên yekberî

li gorî rengê wan

hespê kumeyt: (hespê sor) "kumeyt"
bi taybeti ji bo hespan di wateya rengê sor de tê bikaranîn

hespê şê: "şê" ji bo hespên ku rengê

wan nêzîkî rengê zer e tê bikaranîn.

hespê çal: hespê bes

hespê boz: ji hespên ku rengê spî û gewr didin re tê gotin.

hespê qule: hespên ku rengê wan nêzîkî rengê hêşîn e.

hespê res

hespê belek: hespê res û spî (alaca)

hespê sorboz

hespê resboz

hespê şînboz

Gamêş

gamêş (nêr)

medek: gamêşa mê

gedek: golikên gamêşan

gîsk: ji bizinê 6–7 mehî re tê gotin tûşfir (xamtûşfir): kara mî ya yekberî

nêri teke (bizina nêr)
bizin

Li gorî rengê wan

bizina kever (spî)

bizina çal (bizina bes)

bizina belek

bizina res

li gorî drûvê serê wan (guh û qiloç)

bizina kir (bizina bêguh)

bizina kel (bizina biqiloç)

bizina bel (bizina guhkin)

bizina kol (bêqiloç)

bêçe

varik (fêrik)

mirîşk

têgînê bi sewalan re tekildar

kavirze: kavirên ku berî dema

têne ber beran (cot dibin)

gîze: gîskên ku berî dema xwe

ber nêrî (cot dibin)

kapêçî: noginên ku berî dema

têne ber ga (cot dibin)

newarbûn: ji rewşa ku çelek bi

likên xwe re tekiliyên xwe qut dikî

tê gotin

beravêtin: dema çelek birî

xwe dizên

virnî: ji berx û golikên ku berî



Deve

ner: deva mê

lok: devê nêr

Çêlek (mange)

li gorî temen û zayendê

golika mê

kendik (mozik) yek berî

nogin: (berga) êdî ji yekber(sal) iyê

derbas bûye.

ga

cange

li gorî rengê wan

çêleka çil (spî)

çêleka manto (zer)

çêleka reşbes

çêleka sorbes

çêleka zerbes

çêleka delixer (hêşîn)

çêleka belek

pez

li gorî temen û zayenda wan

bizin

kar

mih

li gorî temen û zayenda wan

berx

kavir: miha 6–7 mehî

berdir (xamberdir): miha yekberî ya

mê

berdir: miha yekberî ya nêr

beran

hogeç: mihênen ku ketine ber (sal) a

sisiyan

li gorî rengê wan

miya tehle (miya qemer)

miya querqaş (spî)

miya quer (reş)

miya suske (hêşîn)

miya sor

miya reşkew (miya quer a serspî)

miya sorkew (miya sor a serspî)

li gorî dirûvê serê wan

miya kel (miya bistrî)

miya ker (miya bêguh)

miya kur (miha guhkin)

sewalêن pînikê

kurk (çêlik)

xwe ji maka xwe bûne re tê gotin

hilî (hilik): ji yên ku dereng ji

xwe bûne re tê gotin.

tewle (axur): cihê ku terşen (çê

ga) mezin lê dihewin

gom (gov): cihê ku terşen (pez)

çuk lê dihewin

dange (dangeh) cihê dotina çêle

bêri: cihê dotina pêz

dirûnge: cihê êmkirina pêz

koz: cihê kar, berx û golikan

guhir (şevîn) cihê ku pez bi şe

dimîne

naxir: keriyê dewêr

dêm: çeregehêن golik û berxan

sordîn: tatê ku pez li ser tê xwêk

doşanî: sewalêن dotinê

têgînê ku temenê sewalan diyar

kin

mekel: salêñ beranan diyar dike

ranê yek mexeli)

zîn: salêñ hespan diyar dike (mî

yek zînî)

ber: salêñ çêlek û pêz diyar

(miha yek berî)

Rêzîmanê kurmancî

- Wane 34 -

SAMÎ BERBANG

Raweya çêbiwar

Ev rawe bi alîkariya raya dema borî a lêkeran û qertafa /-î/ pêk tê. Bi vê raweyê mirov karekî pêkhatî dide zanîn. Ekera di dirûvê raweya çêbiwar de ji er ku çawaniya tiştekî û karekî nîşan ide, di nava hevokê de an dibe rengdêr an jî dibe hoker. Bo nimûne raya ema borî ya lêkera "ketin" her wekî erê jî li ser hatibû rawestandin "ket" ema qertafa /-î/ bê dawiya vê rayeyê raweya çêbiwar a vê lêkerê "ketî" erkeve holê. Peyva "ketî" jî ji ku awaniya tiştekî an jî karekî nîşan dibe engdêr an jî hoker.

Ji bo heman mijarê mirov dikare end mînakân rêz bike.

*Ji lêkera çûnê çûyî
Ji lêkera kirînê kiriyyayî
Ji lêkera çîrinê çîriyyayî
Ji lêkera hatînê hatî
Ji lêkera birînê birî*

Wekî rengdêr

Heke lêkera di dirûvê raweya çêbiwar de çawaniya karekî binimîne, wê demê dibe hoker. Ji bo zelalkirina mijarê em hevokeke bi rengê "têkçûyî vegeeria" saz bikin. Di vê hevokê de "têkçûyî" awayê vegera kesekî nîşan dide, lewre jî hoker e. Çend nimûneyên din dê mijarê zelaltır bike:

*Gundê gewitî
Mirovê dilşikesti
Serbazê têkçûyî
Hevala serkeftî
Mala hilweşiyayî
Rûyê qemirî
Dara helisî
Mirovê melisi
Stérka xuricî*

Wekî hoker

Heke ev lêkera di dirûvê raweya çêbiwar de çawaniya karekî binimîne, wê demê dibe hoker. Ji bo zelalkirina mijarê em hevokeke bi rengê "têkçûyî vegeeria" saz bikin. Di vê hevokê de "têkçûyî" awayê vegera kesekî nîşan dide, lewre jî hoker e. Çend nimûneyên din dê mijarê zelaltır bike:

*Heval bi awayekî jihevketî hat.
Birayê min dilşikeşti vegeeria.
Serkeftî çû, têkçûyî hat.
Jixwe hêvişkesti çûbû.
Çeko mala xwe hilweşiyayî dit.*

Ravekarî (tarîfkarî)

Ji bo ravekirina tiştekî pêwîstî bi ravekariyê heye. Di kurmancî de her wekî berê jî em li ser rawestiyen, ravekarî bi alîkariya vegetandekan pêk tê. Ev vegetandek tiştekî bi taybetiyekî wî ji tiştên din vediqetînin. Di ravekariyê de tiştek rave dike, tiştek jî tê ravekirin. Vegetandek ji dikeve navbera wan û wan herdu tiştan digihîne hev. Bo nimûne dema mirov bibêje, "Bavê Elî" li vê derê pênaşa bav Elî ye. Mirov bi alîkariya Elî bavê wî nas dikan. Vegetandeka /ê/ jî wan herdu yan digihîne hev. Ji ber ku li ser vegetandekê hatibû rawestandin, pêwîst nake mirov careke din li ser taybetiyen vegetandekan raweste. Ravekarî bi alîkariya navdêr, rengdêr û cînavkan çedîbe.

Ravekariya navdêran

Di ravekariya navdêran de tiştê ku tê ravekirin navdêr e. Ew navdêr di rewşa tewandî de ye. Bo nimûne di hevoka "riya bajêr" de peyva bajêr rê rave dike û hatiye tewandin. Di vê ravekariyê de her du jî navdêr in. Çend mînakân din;

*Xalê Zînê
Dara gundiyan
Mala Méran*

Destê hevîl (hevalî)

Birîna dil

Xwarina zivistanê

Gewriya mirovan

Kurmê darê

Di van mînakân jorîn de navdêra ku rave dike, bi piranî tiştekî binavkirî ye. Dibe ku ew tiştekî nebinavkirî be. Wekî,

Dara gundiyeke

Destê hevilanan

Her wiha dibe ku tiştê ku tê ravekirin jî tiştekî nebinavkirî be, wekî

Dareke gundiyan

Peline darê

Heta her du jî dikarin nebinavkirî bin.

Bo nimûne:

Darine gundiyeke

Peline darinan

Ravekariya bi rengdêran

Li vir tiştê ku rave dike rengdêr e.

Wekî mînak

Porê res

Çavén şîn

Çavine zer

Dileki şikesti

Maline wêran

Her wekî ji mînakân jî diyar dibe, dema tiştê ku rave dike rengdêr be tu guherîn tê de çenabê, lewre rengdêr neguherbar in.

diplomasî li ser bingehêke bêheq be, kî dikare êrîşen xwe bi dînyayê bide qebûlkirin? Heger mirov tiştek kir, bila civat jî bipejirîne. Di kirinê van de, ev bîfok tune ye. Hemû dewlet, ji bo kirinê xwe bi hiqûqa navneteweyî ve girîdayî ne. Heger dewletek bibêje ku, hiqûq, mafêni mirovan... û hwd ne xema min in, kî çi bike vê dewletê?

Dewletek hiqûqî, heke dixwaze gelşen xwe yên ligel dewletên din çareser bike, divê li ber hiqûqa navneteweyî nekeve rewşeye neheq û bi tenê nemîne. Helbûkî em iro li rewşa dewleta tirk dinêrin, ji bo tehdîdên li ser Sûriyeyê tû dewlet ne li gel wê ne. Heta dewletan ku bi hev re li ser armancê stratejîk û leşkerî hevkarî çêkirine, yanî dewleta İsrail jî, li hemberî tehdîdên dewleta tirk helwesta xwe ekere kir ku, di wê pevçûnê de bêteref dimîne. Ew; rastiya bêhiqûqiya dewleta tirk e.

Qey dewleta tirk di hundir de bi qasî ku êrîşeye leşkerî pêk bîne, xurt e? Di warê êrîşen leşkerî de, rayedarên dewleta tirk pir bi hêsanî diaxivin. Eger mirov, ji jiyana xwe mînakân dernexîne, ew çax her tiş hêsanî tê xuyakirin! Panzdeh sal in ku, bi deh hezaran mirovan di şerê gemarî de jiyana xwe ji dest da, mixabin hê jî naxwazin qala aştiyê bikin. Kesên ku ji vî şerî mesûl in, wekî ku Tirkîye di nav xêr û xweşiyê de ye tevdigerin. Ji bo ku pêwîstiya aştiyê baş were fêmkirin qey hê mînakân giran lazim in? Bila êrîşê bibin ser Sûriyeyê, ka şer çawa dest pê dike û dimeşe? Ji bo ku, di şerekî de dewletek an hêzek bi ser


bikeve, divê ji aliye siyasî, aborî û leşkerî ve xurt be. Li Tirkîyeyê pişgirîya gelê tirk hebe jî, pirsgirêka herî mezin di hundir de ye û aboriya Tirkîyeyê jî nikare şerekî li dijî dewletekê rake. Heger aborî ne xurt be, artêş jî xurt nabe. Lewre şer ne hêsan e; dewleta tirk dixwaze bi gefan bigihêje armanca xwe.

Şer, bi her awayî, ji bo civatan xetereya herî mezin e. Şerîn biheq û yên neheq hene. Lakîn hemû jî dibin sebeba tahrîbata civakan. Li civaka tirkan binêrin, ji ber şerê gemarî ketiye rewşeye gelek xetere: Edî di civatê de êrîş, kuştin, xwînrijandin, şewat, xirakirin, bazirganiya narkotik, dizî, tecawiz... û hwd. bûne bûyerên rojane. Civakê riya evîndariyê û aştiyê li ber xwe winda kiriye. Her roj di televîzyon û çapemeniya tirkan de, gelek nûçeyen ku li ser psîkolojiya civatê tesîreke xirab pêk tînin, têne weşandin. Her wiha ewqas neyartiyek bêhidûd li dijî gelê kurd dîmeşîn. Heger serokomar, serokwezîr, wezîr û yên din, wekî pêxasekî her roj qala lêxistin, kuştin û êrîşan bikin, dê civak ci bike?

Dewleta tirk, bi vê hovîtiya xwe bi tenê civata tirk xirab nekir, hê zêdetir gelên din jî bi xwe re kirine vê rewşa xerab. Ji hemûya bêtir jî, civata me kurdan kete rewşeye giran. Hemû jî, ji politîkayê hovane peyda dibin. Carinan ez ji xwe dipirsim; me kurdan ci xirabî bi dewleta tirk kiriye ku, ew qas neyartiyek li dijî gelê me dîmeşîne? Gelo tu mînakân din wekî vê, hene?

Êrîşa li Ser Sûriyeyê

MAHMUT KILINÇ



Dewleta tirk van rojên dawîn, xwe amade dike ku êrîş bere ser Sûriyeyê. Qey bi rastî dixwaze êrîş bike, an jî wekî her car bi tehdîtên ku difirîne, dixwaze daxwazên xwe bi dest bixe? Rojên ewil, dema mirov li çapemeniya tirkan dînihêrt, wekî ku ser dike dest pê bike diaxivîn. Heta hinekan ji wan digot: "Artêşa me dê xuriniyê li Deriyê Cilvegözü, firavînê li bajarê herêmê û şivê jî li paytexta Sûriyeyê li Şamê bike." Hinek nivîskarîn rojnameyan û politîkvanê tirk jî, di axaftinên xwe de digot: "Di 24 saetan de em dê Sûriyeyê bidin bin pêlîn xwe." Belê, ba ketiye bêvilan, ka wê li kîjan zinarî biqelbin!

Bi rastî dewleta tirk, bi qasî ku van gotinê xwe bi cih bîne, xwedî hêz û çek e? Wekî ew dibêjin artêşan wan, ev qas mezin e? Hinek eskerên wan jî dibêjin, pişti DYAY'ê em in! Bi qasî ku ew dibêjin ne rast e. Panzdeh sal in ku bi îmkanên gelek kêmîtir, kurd telesiya van gotinan dîkin û hêzén kurdan, tu caran jî metodîn gemarî bi kar neanîn. Hê dewleta tirk pê nehesiyaye ku hêz û çek bi tenê nikinan her tişti bi dest bixin. Heke siyaset û

Yek ji gerîlayên ku li Antalyayê terme wî ji gore hatiye derxistî,

Fevzi Önal

Rêheval Fevzi Önal li Mûşê li navçeya Milazgirê li gundê Qasimiya Riza ji dayik bûye. Malbata wî pir xizan bû. Li gund û herêma ku lê dijiya, serdestiya axa û eşiran hebû. Lewma digel belengazî û xizaniyê gelek zor û tediyî li ser malbata wî dihate meşandin. Vê zilm û zorê, malbata Hevalê Fevzi kevneperekst û muhafazakar kiribû û ew ji hezkin û girêdana welêt dûr xistibû.

Hevalê Fevzi piştî ku dibistana seratayî qedand, ji bo ku barê li ser pişta malbata xwe sivik bike, dest bi rênberiyê kir. Demeke dirêj, bi vî awayî ji alyî aborî ve bû alîkarê malbata xwe. Di vê navberê de ji ber rewşa aborî û civakî, nakokiyân mîjîyê Hevalê Fevzi mijûl dikir û berê wî dida lêkolînê. Lî belê tu rê nedidîtin ku, wê çawa li dijî vê pergala paşverû têbikoşe. Her çiqas li herêma ku lê dijiya bingeha welat-parêziyê xurt bû jî, bagera 12'ê rezberê gelek nirkhê neteweyî û civakî basko kiribûn. Lewma Hevalê Fevzi her tim li dijî dagirker û kedxwaran bi hêrs û rik bû. Ew, lê dixebitiya ku vê hêrs û rika xwe bi awayekî rîexistinî li dijî dagirkeran bi kar bîne. Di sala 1990'î de wekî gelek deverê Kurdistanê germahiya têkoşîna Tevgera Azadîxwaz bandora xwe li Milazgirê jî kir. Hevalê Fevzi jî ji vê germahiyê bêpar nema û berê xwe da têkoşînê.

Salêñ Zindanê

Dema cara pêşin şervanê azadiyê diçin gundê wan, li gund civînekê li dar dixin û gundî wan bi dilgermiyeye mezin dihewînîn. Lî mixabin Hevalê Fevzi, ji vê yekê bêpar dimîne. Ji ber ku wê şevê ew ne li gund bûye. Dema ku dibihîze gerîla hatine gundê wan, gelekî li ber dikeve. Lewre bi pey gerîlayan dikeve lê mixabin nagihije mirazê xwe. Wan salan li herêmê gelek serhildan rû didin. Hevalê Fevzi di hemû serhildanan de cih digire lê ew ketibû taya dîtina gerîla. Rojekê meha

Remezanê gerîla diçin gundê wan û ci-vînekê çedîkin. Hevalê Fevzi jî di vê civînê de amade dibe. Piştî civînê Hevalê Fevzi bi coşke mezin dibêjê: "Ez dixwazim tevî nav refen gerîla bibim." Lî wê şevê, ji ber rewşa koma gerîlayan dest nade, daxwaza wî bi cih nayê. Dawiyê gerîla soz didinê ku, dê rojekê werin wî hilinîn nav refen gerîla.

Hevalê Fevzi bi van xewn û xeyalan

xemgîn dibe jî, lê ew vê pêvajoya zindanê ji bo naskirina rastiya xwe û gelê xwe, dîroka xwe û Partiyê wekî fersendekê dibîne. Bi rastî jî, di vê pêvajoyê de qet kîliyeke dema xwe betal derbas nake. Bi xwestek û coşke mezin xwe dide perwerdehiyê, her çiqas xwendin û nivîsandina wî giran be jî, di demeke kin de hem hînî xwendin û nivîsandinê dibe, hem jî ji hêla ziman, wêje, dîrok,



Di wêne de gerîlayen li Antalyayê şehîd ketine têr dîtin

li gund dimîne û li hêviya gerîlayan di-sekine. Lî demeke dirêj ji ber bêgaviyê, riya gerîla bi gundê wan nakeve. Hevalê Fevzi jî ji ber tengasiya aborî dide ser riya Stenbolê û li ûnsetan kar dike. Tevî vê yekê bi xebatkarênu ku di nav eniyê de ne re jî têkiliya xwe xurt dike. Peyre biryara xwe ya dawî dide û diçe ku tevlî refen gerîla bibe. Lî mixabin, siûda wî baş naçe, xeyalênu wî pêk nayê. Tam derdikeye ser rî ku xewn û xeyalênu xwe pêk bîne, ji teref dijmin ve tê girtin. Rêheval Fevzi nêzîkî sê salan di Girtigeha Sağmalçilarê de dimîne. Bi vê girtina xwe hînek

felsefe û rastiya şer ve xwe bi pêş dixe.

Ew civaka ku bi sed salan ji siyaset, wêje, dîrok, çand û bîrdoziya xwe dûr mabû, bi xwezayî tesir li Hevalê Fevzi jî kiribû û ew ji zanist û perwerdehiyê bêpar hiştibû. Bi wê şewq û xwestekê di perwerdehiyê de, di jiyanê de, di nav têkiliyan de hîn dibû, tiştên ku hîn dibû di jiyanê de pêk dianî. Di têkiliyan de tiştên ku di perwerdehiyê de hîn dibû nîqaş dikir. Li zindanê rojêne pêşin pir şermoke bû. Heya mirov pê re nepeyiviya, ew bi xwe zû bi zû nedipeyivi. Lî piştî ku hînek perwerdehî dît û alîkariya hevalan bi taybetî jê re çêbû, roj bi roj wekî gulekî pişkivî. Li gorî hêza xwe jiyan raçav dikir, kêmâsi rexne dikir, di civînan de rûdan dinirxandin û pêşniyar pêşkêş dikir. Dema di zindanê de bû, xewn û xeyalênu wî tim li ser gerîla bûn. Analîzen Serok bi baldarî dixwend, jê encam derdixist, kêmasyîn ku di nav jiyanâ gerîla de qewimîbûn, bi hevalênu ku ji nav gerîla hatibûn re nîqaş dikir, ji bo fîmkirina jiyanâ gerîla cehd dikir û diğîşte encaman.

Di nav gelan de pir danîn

Rêheval Fevzi piştî ku nêzîkî sê salan di zindanê de ma, tehliye bû, di demeke kin de li Eyaleta Deryaya Spî


Dema li Antalyayê termen gerîlayan ji gorê wan hate derxistin, gele deng vedabû. Balkêş bû wê demê raya giştî ya Tirkîyeyê ji ber kuştina kûcîkekî rabûbû ser piyan. Lî li alyî din televîzyonê tîr ji gor derxistina gerîlayan we "serketinekê" pêşkêş dîk Fevzi Önal jî di nav wan gerîlayan de şehîd ketibû. Hevalê Önal yê girtigehê ev nivîs amade kirine, hûn dê vê nivîsê li ser serpêhatiya Fevzi Önal agahdar bibin.

tevlî refen gerîla bû û xewn û xeyalan xwe pêk anîn. Şervanê azadiyê şax xwe avetibûn nav gelên Anatoliyê. Şeşa Tirkîyeyê bi ya Kurdistanê re bû bû yek. Gerîla, li Deryaya Spî belav bûbûn û koka xwe qewîn berdabûn Anatoliyê. Ji Welatê Rojê pêtê agîn azadiyê derbasî nava gelê Anatoliyê kiribûn, da ku ew pêtê agîrê azadiyîm ges bibin. Ew gelên ku bi sed sali hemberî zilm û zorê li ber xwe dabûn û sopa Şêx Bedredin û Baba İsa şopandibûn, bi perdeke reş hatibûn pêçandin. Wan, ev perdeya reş ji sewan radikir.

Hevalê Fevzi û heşt hevalê wi 11-12' ê Nîsana 1998' an de li bajat Antalya li navçeya Serikê li herêma Gebîzê ketin kemîna dijmin. Bi ber wedaneke mezin şer kirin û tevlî karvanê şehîdan bûn. Lî belê ev şehadetekî wisa bû ku nedîşibiya heşhadetê. Dîroka dagirkeren tîr a huvane careke din dubare dibû. Edî tu nirkhê mirovatîyê li cem wan nemabî Ewqas hov û wehşî bûn ku; êrisî li se cihê ku neh egîdîn azadiyê tê de vespibûn dikir û bi dest û lepan axa sewan vediрут û cesedê wan ji bin axderdixistin.

Rêheval Fevzi! We bi xwîna xwe xa Mezopotamyayê û Anatoliyê bi heve kelijand û vestirand. Her ku hûn mîna teyrê baz ber bi stêrkîn asîmî Medya ve bilind dibûn, dijminê xwîn war û nokerên wan jî, ji ber heybetî fizîna per û basken we, xwe dimelisâdin û di erdê de diçûn xwarê. Bila di we rehet be. Bi soz û peyman be emdê werin û kulîkîn azadiyê, ku bi xwîna we ya sorgevez li ciyayê Amnosê pişkivîne, biçînîn, deste bi destîn zarokên gelên we.

HEVALÊN WÎ YÊN GIRTIGEHÊ



HEBÛN

Hebûn

*Min dixwest ez bibim agir
li çar aliyan
li çar perçeyan,
li Amedê, li Dêrsime, li Sipanê*

*Min dixwest ez bibim agir
28'ê adarê li Gabarê
ji bo desten diqesili agir,
ji bo lêven dihejiyan derman.*

**Hevalê Hebûn tu tekoşîna me de dijî
Şehîd namîrin**

CIWANÊN WELATPARÊZ EN AMEDÊ

□ 22.10.1993:
Qetliama Licê

Di meha kewçera 1993'yan de, dewleta tirk bi kuştina generalê xwe

Bahiyar Aydin dest bi gulebarandin û şewitandina Licê kir. Qellama Licê di saet 10.30'ê sibê de dest pê kir, heta ber bi êvarê dom kir.

Di dawiya bêyerê de 242 dûkan hatin rûxandin, zêdeyî 30 kesî jî hatin kuştin.

BÜYERINE JI DİROKÊ



□ 22.10.19840:

Cegerxwîn wefat kir

Cegerxwîn di sala 1903'yan de li bajarê Mêrdînî li gundê Hezarê hate dinê. Navê wî yê rastîn Şêxmûs e. Ew di biçükîya xwe de sêwî maye, şivanî û xulamî kiriye. Wî zordariya axan, began û dewlemendan dî.

Piştî demekî bo xwendinê dikeve medreseyê. Li başûrê Kurdistanê di zanîngehê de dersan dide.

Helbestên Cegerxwîn di Hawarê hatine weşandin. Di salên cur bi cur de çar dîwanêne Cegexwîn hatine çapkirin.

Êrîş qîma têkbirina xebatê NÇM'ê nakin



Koma Medya

Her wekî tê zanîn ev demeke dûvdirêj e ku dewleta tirk terorê li ser saziyên welatparêz bi awa yekî hovanetir dimeşine. Ji bo ku çanda kurdan têk bibe û bifetisîne dewleta tirk dest bi polîfikayen xwe yên genî û hovane kir di bin navê marjînal-kirinê de piştî girtina şaxa NÇM'ê ya Amed û Ruhayê, salona NÇM'ya şaxa Edeneyê û Mêrsinê jî ji aliye polisan ve hate morkirin.

Ji ber van sedeman ev demeke dûvirêj e ku NÇM'ya Mêrsinê nikaribû çalakiyên xwe pêşkêsi gel bike. Ji bo pûçderxisitna van êrîşan, xebatkarên şaxê û birêveberiya HADEP'ê biryar sitand ku êdî ji niha û pê ve NÇM çalakiyên xwe yên hunerî li navçe û beldeyên HADEP'ê pêk bîne.

Li gorî vê birayrê ewil Koma Hemdem li Beldeya Torosan û Yenişehirê, her wiha Koma Vendidan li beldeya Akdenizê konsekerek pêşkêsi gel kir.

De dehê meha Kewçerê de, dîsa NÇM şaxa Mêrsinê bernameyek li dar xist. Bernameya ku li salona HADEP'a şaxa Mêrsinê hate pêşkêskirin, bibeşdariya 500 kesî pêk hat. Çalakî di şexsiyeta M. Halit Oral de ji bo hemû şehidîn şoreşê digel rawestîna rêzgirtinê bi xwendina merşâ Ey Reqîb dest pê kir û Koma teatrây Koma Dîlana Şoreşê lîstikek bi navê

"Qambûr û Zambûr" pêşkêsi temashevanan kir. Lîstika gelêrî ku bi taybetî li herêma Amed û Bilîsê tê lîstin pir bal kişand ser xwe. "Qambûr û Zambûr" taybetiyekê dihundirîne ku lîstikyan hem dîlanê digire hem jî rista şangoriyê pêk tîne, her wiha ligel def û zurneyê tê lîstin.

Piştî Koma Dîlana Şoreşê Koma folklorê ya zarokan Koma Medya bi lîstikên xwe yên herêma Amedê derket ser sehnê. Ev koma zarokan ji aliye NÇM'ya Mêrsinê ve tê perwerdekirin û bi hunera ku pêşkêş dîkin, temashevnan kêfxweş dîkin.

Her wiha ji NÇM'a Edeneyê Koma Sarya konsekerek dûvedirêj pêşkêsi gel kir. Komê bi kilamîn xwe yên xwes, reng da şahiyê.

Ji niha û pê ve wê çalakiyên bi vî rengî berdewam bikin.

FATÎH BENDEWAR /A.WELAT MÊRSİN

PÊŞBAZAN XELATÊN XWE GIRT

Pêşbaziya çîrokan ku Navenda Çanda Mezo-potamyayê li dar xist bi dawî bû û roja 11'ê kewçerê li "Marti Sanat Evi" bi şahiyekê xelatên serketian hatin dayîn.

Di bernameya xelatdayîna ku bi rawestîna rêzgirtinê vebû de ji beşa kurdi û tirkî şes berhem şayanî xelatê hatin dîtin. Di kurdi de berhem "Xezal" ji Girtigeha Bartinê Harbi Soylu yekemîn; Ji Amedê Dîlawer Zeraq bi çîroka "Hebîn Baranê" xelata duyemîn; Tayip Kalın jî bi çîroka bi navê "Asê" xelata sêyemîn girt. Di warê tirkî de xelata yekemîn ji Ruhayê Deruz Gönüllü çîroka bi navê "Adımlarımı Topluyorum Döndüğüm Yere" xelata yekemîn; ji Girtigeha Bartinê Fesih Erdemirci bi navê "Özgür-lük Dağlardaydı" xelata duyemîn û ji Enqereyê

Mehmet Baranaydin "Harman Sonu" xelata sêyemîn girt.

Her wiha di kurdi de berhem bi navê "Mirina du serî" a H. Kovan Baqî, di tirkî de jî bi navê "Bêriya Karikan" Saim Babayigit-Stenbol; "Parola" Mustafa Sönmez; "Gelincikler Açı Çekmez" Turan Demir; "Çicek Ana" Eyüp-han Başar; "Bir Son Gün Öyküsü" Uğur Kara xelatên taybet ên jûriyê standin.

Ji sedema ku kesîn xelat standin bi piranî di girtigehê de bûn, xelatê wan ji aliye nas, mîvan û xebatkarên NÇM'ê ve hatin girtin. Ji bo pêşbaziye bi temamî, di warê kurdi de 25, di warê tirkî de jî 76 berhem hatibûn şandin.

A.WELAT/ STENBOL

ÇAVDÊRÎ

Dermanê wan bersiva agirbestê ye


SERKAN BRÜSK

Jî roja ku Tevgera Rizgarîxwaz a Kurdistanê dest bi têkoşîna rizgariya gel kiriye heta iro, dewleta tirk her dibêje: "ew jî derve ve tê xwedîkirin, koka wê li derve ye û hejmarek dewlet (bi kîmanî heta niha navê deh dewletan hatiye hejmartin) li pişta wê ne." Pir caran jî, ev dewletênu ku navê wan derbas dibin, hevalbendênu wan in. Mînak İtalya, Almanya dewletêni iskandinavya, heta Ermenîstan (heta duh jî Türkîs diçû wir û dihat) û hema kî ji saziyek kurdan re gotibe merheba. Temam. Êdî ev dewlet dîn dijminê tirkan e.

Bi rastî tirk bi van kirinên xwe dikin ku kenê guran jî, bi wan were. De jixwe li birêveberên Tirkîyê binerin. Dostekî tenê ji bo Xwedê, ma hogirekî van birêveberan heye? Ma wê çawa hebe? Ma tu gel cîran yan ne cîran maye ku ji destênu wan xerabî nedîtin. Yewnan, ermenî, ereb, kurd, asûrî-suryanî, ecem, ewrûpî û gelek miletênu din. Heta cûdahîyeke pir mein di navbera van tirkên kemaflîst û yên li Asyayê de heye. Lewre yên Asyaya Navîn, piştî demekî, fîr bûne ku bi gelên binecîh re di nava xweşî û başiyê de bijîn. Paşê jî tecrûbea sosyalîzmê ne hindik e. Çanda sosyalîst ew fîr kirine ku bi gelên cîran re weka bira bidin û bistînin. Ger em azeriyan li aliye kîbihîlin hemû dewletênu din, bi cîranen xwe re baş in. Azerbeycan jî ji ber ku hinekî tesîr û nîfûsa kemaflîstan li ser wan heye, wisa tevdigere. Ev dewletênu tirk ên li Asya, iro vê polîfîkaya nîjadperest zêde nafejiyîn û wisa xuya dike ku ew bi gelên li dora xwe re di nava aştiyê de bijîn.

Em dîsa li birêveberên kemaflîstan vegezin. Ev serê çend rojan e ku taqîmê xwe yê mehteran deranîne û li dahola şer didin. Bab-i Ali jî bi weşana xwe tevli êrîşê dibe. Jixwe siyesetmedar ji berê de amade ne. Ci ye ne ci ye? Dewleta Sûri piştigiriya Partiya Karkeren Kurdistanê dike, Serokê Neteweyî Birêz Abdullah Öcalan li wir dimîne. Îcar ci? Ma ev çardeh sal in ku hûn vê dibêjin. Ma niha ye. Ha, li we teng dibe. Hûn bi hin hilbijartinan re, bi awayekî cîdî hatine hemberî hevde, piyêne we ketine solek teng.

Êdî hûn nema vê li xwe vedişerîn. Heta duh we digot çend eşqiya ne. Lî iro jî, hûn jî bo van çend kesan dîkin şereki mezin li hemberî çend dewletan bidin. Serok-komarê wan dibêje, "Bila cîhan me bibihîze. Em ê dînyayê xera bikin. Agir ketiye dawa me. Bila Sûriye hay jî xwe hebe, emê Şamê bi ser wan de hilweşîn". Ev gotinêne Demirel in. Ne yên tiredînekî ne. Rast e, karkeren kurd qû li dewletê teng kirine. Wel kabûsekê çok dane ser singa wê. Dinya li ber çavê wê reş kiriye. Yeko yeko damarên wê yên jiyanê hişk kiriye. Ew sewsî kiriye. Ew har û dîn kirine û berdane meydanê. Lî dîsa jî, bi ser vî halê wê de jî ew dibêjin em dikarin wê rehet jî bikin. Dermanê wê jî li cem me heye. Çawa me kir ku ev qas nexweşî bi carakê lê derkeve her wisa jî em dikarin, hemû nexweşîyê wê derman jî bikin. Ma ne ji bo vê yekê bû ku van agirbestek yekalî kirine. Wan bi riya serokê neteweyî diyar kir ku ew dê şansekî bidin wan. Ji bo ku ew hîn gavan di riya mirovahiyê de biavêjin û xwe hînekî ji qirêjiyan rizgar bikin. Lî wan qet deng jî nebir xwe. Tora em dibînin ku ew operasyonên mezintir li dar dixin, dixwazin têkevin başûr û heta heta Sûri jî dagir bikin. Hemû dewleten ereban û yên herêmê diyar kir ku ev yek jî tirkan zêde ye û dê ji wan re neserîfe. Heta İran dibêje dê tirk herî zêde ji êrîşkê wisa ziyanê bibînin. Qedafî li singa xwe dide. Werhasil hemû dewleten herêmê ya xwe li hemberî tirkan kirine yek. Piştî vê hevgirtinê ez bawer nakim ku tirk tişteki bikin. Tenê tişte ku tirk bikin, bersîva agirbesta Serok e. Ji vê pê ve tu dermanê wan tune ye.



Türkiye li fezayê jî

Türkiye, tevî agîrbesta yekalî ya PKK'ê, zora dewletên Ewrûpa û raya gişî ya cîhanê vê dawiyê bêhfir şerpe weşanên MED-TV'ye sinal hatîn şandin û peyre bi biryara Walîtiya OHAL'ê belavkirina Azadiya Welat li êrîşan wekî dirêjiya "konsepta marjinalkîrinê" û nexweşiya di navbera Sûriye

Hefteye borî di rojeva Kurdistaniyan de mijara sereke êrîşen li dijî MED-TV'ye bûn. Gel û gelek saziyên Kurdistanî û demokratik bi şeweyekî tund li dijî van êrîşan rabûn û yekser bo MED-TV'ye piştgiriya xwe diyar kir. Di heman demê de rayedarêne Tirkîyeyê piştî Ülkede Gündemê ji bo Azadiya Welat jî li Herêma Awarte (OHAL) biryara qedexekirinê girt. Derdorêne welatparêz û şoresger van êrîşan bi "Konsepta Marjinalkîrinâ Tevgera Neteweyî ya Kurdistanê" ve girê didin. Her wiha ew, balê dikşînin ser nexweşiya di navbera Tirkîye û Sûriyeyê û didin zanîn ku, Tirkîye dixwaze bi van êrîşan bi rehetî karê çewt-agahdariyê pêk bîne.

MED-TV di şerê teknikî de bi ser ket

Êrîşen navborî cara yekemîn şeva 9 kewçêrê di dema bernameya "Panelê" de pêk hatin. Rojê dîstir jî êrîşan bi awayekî rîkûpek dom kir. Bi pey agahiyê berpirsiyaren MED-TV'ye navenda van êrîşen sinal Stenbol e û her wiha bi metodekî leşkerî, ku wekî "şehkirina radarî (radar tarama)" tê binavkirin, têne lidarxistin. Dîsa li gorî berpirsiyaren MED-TV'ye ji bo êrîşan komîsyoneke

taybet hatîye sazikirin û ew komîsyon 24 seatan li ser kar e. Li aliyê din MED-TV li dijî vî şerê teknikî peyka (satelîte) xwe guhart, lewre êrîşen li dijî wê rawestîyan. Ji ber ku dema sinal bêne weşandin, dê weşana nîvê televizyonen cîhanê têk biçe.

Wekî diyar e cara yekemîn di roja 15

Rayedarêne Tirkîyeyê MED-TV'ye bi terorîsfî û sîdetperestiyê tawanbar dîkin. Lî ITC heta îro digel ku bi awayekî tûj doza prensîbênen xwe dike, ji bo MED-TV'ye ceza nebiriye, ev li aliyekî hişyarnameyek jî neşandiye.

berfanbarê sala 1995'an de bo weşanên MED-TV'ye sinal hatibûn şandin. Balkes e wê rojê jî dîsa di dema bernameya Panelê de, ku biryara agîrbestê dihat ragihandin, weşana MED-TV hatibû astengkirin. Ev êrîş, di warê xwe de li cî-

hanê wekî yekemîn êrîş tê hesibandin. Li gorî ragihandina pisporê teknikî, li êrîşen bi vî rengî gelek pere diçin. Her wiha ew didin zanîn ku êrîş di sala 1995'an bi 20 milyar dolaran hatîye lidarxistin û bihayê êrîşen dawî jî sê caran ji van zêdetir e.

Berpirsiyaren MED-TV'ye di daxuyaniya ya li ser êrîşan de da xuyakirin ku Tirkîye bi van êrîşan dixwaze krîz û rûresiya xwe veşere, çeteti û mafiyatiyê ji wekî karê welatparêzan nîşan bide. Di dirêjiya daxuyaniye de wiha tê gotin: "Dema ku li Tirkîyeyê karêne neqanûnî û sextekariyê zêde dibin, propagandaya 'Vatan, Millet, Sakarya' tê gurkirin." Her wiha hate ragihandin ku, dema têkoşîna rîzgariya neteweyî ya Kurdistanê gur dibe, bêhntengiya Tirkîyeyê ya ji bo MED-TV'ye jî zêde dibe, lewre MED-TV daxwazên siyasi û neteweyî yên gelê kurd pêşkêşî cîhanê dike.


Endamên Parlementoya Ewrûpayê: Ev skandal e

Li pey van êrîşan roja 14 kewçêrê delegasyoneke ku ji berpirsiyaren MED-TV, PKDW û Yekîtiya Rojnamegerên Kurdistanê pêk dihat, digel endamên Parlementoya Ewrûpayê, bo çapemeniyê daxuyanî ragihand. Di çalap-

SERBAJARÊ KURDISTANÊ BÊ 'WELAT' MA

Azadiya Welat, li Kurdistanê hate qedexekirin Belavkirina rojnameya Azadiya Welat, ku yekane rojnameya xwerû bi kurdî ye li bakurê Kurdistanê, roja 12 kewçêrê 1998'an bi biryara Walîtiya Herêma Awarte (OHAL) li bajarê Amed, Dêrsim, Culemêrg, Sêrt, Şîrnek û Wanê hate qedexekirin. Berpirsiyaren Azadiya Welat roja 15 kewçêrê li şaxa Komeleya Mafêni Mirovan ya Stenbolê daxuyaniye çapemeniyê saz kir. Di daxuyaniye de Gerînendeyê Gişî yê Azadiya Welat Sami Tan, Endamê Komîteye Rêveberiya Gişî ya HADEP'ê Mehmet Nuri Güneş, parêzera Azadiya Welat Fatma Karakas û Berpirsiyara Karê Nivîsaran ya Ülkede Gündem Filiz Duman amade bûn. Di cîvîne de pêşîn Gerînendeyê Gişî yê Azadiya Welat Sami Tan daxuyaniye çapemeniyê xwend. Di daxuyaniye de hate ragihandin ku, ew bi vê biryare şâş û metel nemane, lewre nîşaneyen vê yekê ji zû de rû dane. Her wiha behsa êrîş û çewsandinên li ser MED-TV, rojnameya Ülkede Gündem, HADEP û Dayika Şemîyê hate kirin û wiha hate berdewamkirin: "Dewlet bi vê helwesta xwe nişan dide ku, wê li dijî çapemeniya kurd û hêzên muxalif şer û lan kiriye û çeteyan jî diparêze. Diyar e êdî rewşa awarte ne tenê li bajarê kurdan, li hemû Tirkîyeyî li dar ketiye. Ev biryara li ser Azadiya Welat karê dewleta ku di bin destê çeteyan de ye." Li aliyê din li ser biryaren berhevkirin yên bo Azadiya Welat hate rawestandin û hate gotin ku ev biryareke kêtî ye, lewre heya iro hejmareke rojnameyê hatîye berhevkirin û ji bo du hejmaran jî doz hatîye vekirin. Dîsa êrîşen li ser nûnergehêne Azadiya

ser vê yekê em ji raya gişî ya demokratik daxwaza pejinkariyê dîkin." Di cîvîne de parêzera Azadiya Welat Fatma Karakas da zanîn ku ji ber ku hiqûqa naxweyî rê nade doz vekirine, ew dê serî li Dادgeha Mafêni Mirovan ya Ewrûpayê bidin. Endamê Meclisa Partiyê ya HADEP'ê Mehmet Nuri Güneş bal kişand ser pîrozbahîyen bo salvegera avabûna Komara Tirkîyeyê û got ku Komara Tirkîyeyê bûye komara çeteyan. Her wiha wî diyar kir ku li cîhanê tu dewêrîşen dewletê her gurtir dibin, ew dê li ser xeta berxwedanê tê bikoşin û piştgiriya Azadiya Welat bikin. Her wiha berpirsiyaren Azadiya Welat roja 15'ê kewçêrê digel Berpirsiyare Çapemeniyê yê Balyozxaneya Îngilistanê yê Stenbolê Neil Frapse, hevditînek pê anîn. Wekî din li Amedê jî ev biryara bi daxuya-nyeke bo çapemeniyê hate şermezarkirin. Di çalakiya ku 300 kesî tê de besdarî kir de, nûneren HADEP, Platforma Demokrasiyê, DBP, Hêvî, Ülkede Gündem, Özgür Halk hebûn. Li aliyê din İnstîtuya Kurdi ya li Stenbolê jî êrîşen dawîn bêpar nema. Endamê kargeriya İnstîtûye ziman F. Hüseyin Sağıncı roja 15'ê kewçêrê, di dema serlîdana bo pasaportê de ji aliyê polisîn ji şaxa têkoşîna li dijî terorê ve hate derdestkirin. ■



kiyê de Serokê Komîsyona Parlementoya Ewrûpayê ya Azadiya Derbirina Ramanan û Weşanê Haidi de Anconna û girse jî amade bû. Di vê navberê de parlementeran bo MED-TV'ye piştgiriya xwe ragihand û ev êrîş wekî skandal bi nav kir. Her wiha berpirsiyaren MED-TV'ye dosyayek pêşkêşî parlementoran kir û wan ev dosya hilanî. Li aliyê din li ber avahiya Article 19, ku ji bo azadiya çapemeniyê têdikoşe, Gerînendeyê Gişî yê MED-TV'ye Hikmet Tabak, Serokê Article 19 Francis de Souza û parêzera MED-TV'ye Marc Stefan di civîneke çapemeniyê de êrîşen li ser MED-TV'ye şermezárkirin. Di cîvîne de Francis de Souza da zanîn ku ew dê li dijî wan êrîşan her li cem MED-TV'ye cih bigirin.

Wekî tê zanîn MED-TV ji aliyê resmî ve saziyeke îngîlîstanê ye, lewre endamê ITC (Saziya Serbixwe ya Televizyonê). MED-TV bêyî destûra ITC nikare weşana xwe bidomîne. Ji bili MED-TV'ye di bin bana ITC'ê de 70 televizyonen navneteweyî weşana xwe pêk tînin. Li aliyê din bi pey agahiyê

erket nêçîra kurdan

ike û berê xwe dide saziyên kurdan. Pêşîn bo hate qedexekirin. Derdorêñ welatparêz van eyê de dibînin.



siyaren MED-TV'ye rayedarêñ diyar kirine ku, ew ne xwedî mezin in ku di warê teknîkî de li êrişan tê bikoşin lê wan daye za- u ew dê lêkolinê bikin peyre jî li Peymana Çapemeniya Azad doza xwe bikin. Tirkîye jî yek ji dew- ku ev peyman imze kiriye ye.

layê din wekî diyar e rayedarêñ eyê MED-TV'ye bi teroristî û şîrestiyê tawanbar dikan. Lî ITC he- digel ku bi awayekî tûj doza pren- xwe dike, ji bo MED-TV'ye ceza- siye, ev li aliye kî hişyarnameyek jî ndiye. Li gorî prensibên ITC; divê sîyon bi tu parti û saziyan ve ne dayî be, di weşana xwe de objektif pesna şîdetê nede.

■ piştgiriya Azadiya Welat kampanya

i diji van êrişan Kurdistaniyan li ge- aleveren cîhanê, bi awayekî berfireh girt û bo MED-TV'ye piştgiriya ragihand. Bi pey gotinê berpirsi- yan MED-TV'ye telefonê wan asê . Li aliyê din bi pêşengiya Azadiya

Konsepta Marjînalki- rinê li ser kar e

Wekî dixuye piştî ku belavkirina Azadiya Welat jî li Herêma Awarte hate qedexekirin, ji bilî MED-TV'ye tu dez- gehêñ ragihandinê ku li Kurdistanê agahî û nûçeyan belav bikin, namînin. Her wekî tê zanîn li Kurdistanê belavkirina Ülkede Gündemê jî qedexe ye. Dîsa şaxa Komeleya Mafêñ Mirovan ya Amedê girtî ye. Ev jî dide xuyakirin ku dewletê li ser Kurdistaniyan şerekî psikolojik yê hê tund daye destpêkirin. Ev jî li gorî "Konsepta Marjînalkirinê" tê meşandin. Her wiha vê dawiyê jî ber nexweşîya di navbera Sûriye û Tirkîye de, pêwîsti- ya Tirkîye bi şerê psikolojik heye.

NAVENDA NÛÇEYAN

TELEVİZYONEKE ZÊDE DEMOKRAT :

MED-TV

Cem Boyner, dema Serokê Tevgera Nû ya Demokrasîwaz bû, çûbû Kurdistanê û ji ber rewşa MED-TV'ye şas û metel mabû: "Yahû! Zilam ji bo ku li MED-TV'ye temaşe bike, pezê xwe giş firotiye. Diyar e ev zilam dê birçî bimîne!" Ev gotin, dilxwaziya Kurdistanîyan ya li ser MED-TV'ye geleki baş didin der. Gelê Kurdistanê di demeke kin de bû bengiyê televîzyona xwe. Tevî ku dê birçî bimîne jî, kete taya "sêlikan". Édi raytinga malbatênu ku li mala wan MED-TV hebû, bilind dibû. Bayê wan geleki bilind dihat! Li cihênu ku kurd lê dijiyan û bajarê Kurdistanê "moristana sêlikan" peyda bû.

Li aliyê din ronakbirêñ tirk û di serî de Turgut Özal, rayedarêñ Tirkîyejê jî di- got: "Xeman nexwin! Em dikarin mafêñ çandî yên kurdan bidinê. Lewre kes li televîzyona bi kurdî temaşe nake." Balkêş e demokratêñ tirk (!) (Zülfü Livaneli, M. Ali Bi- rand hwd.) ji ber vê yekê aligiriya vê yekê dikirin. Heke ku kurd li televîzyona xwe xwedî derketana, dê li dijî vê yekê rabûna. Jixwe tîrsa Tirkîyejê ya ji ber MED-TV'ye geleki mezin û xedâr bû. Di hevdîtinêñ diplomatik de bû mijara sereke. Vê tîrsê Sig- mund Freud şeytanqûnî (hortlama) kir û wî ji dil û can li vê tîrsê kola. Ji ber ku tirseke bi vî rengî di literatûra psikolojiye de tunebû. Wekî tê zanîn demekê li bajarê Tirkîyejê li Denizliyê weşana MED-TV'ye li dêvla televîzyoneke tîrkan derketibû, rayedarêñ ba- jar yekser ceryana bajêr qut kiribû.

Akademîyeke Cîhanî

Piştî ku kurdan berê xwe da "welatê xeribiyê" her digotin: "Heft xwezî bi rojêñ berê û şevbûhêrkan". Piştî MED-TV'ye tîn û germâhiya şevbûhêrkan careke din li mala kurdan peyde bû. Têkiliya kurdan xurt û germtir bû. Lî MED-TV'ye wekî şevbûhêrkan tenê dilê kurdan germ nedikir, her wiha bû mêjîyê kurdan jî. Dawiya dawî wekî akademîyeke cîhanî kar dike. Édi bi MED-TV'ye şevbûhêrken kurdan bûn "şevbûhêrken zanîstî". Bi tabaybetî roja Panelê şevbûhêrgerm û xweşîr dibin.

Li aliyê din kurdêñ ku xwe ji têkoşînê didan alî, dema li MED-TV'ye temaşe dikirin: hêdî hêdî berê xwe didan têkoşînê û bi kurdayetiya xwe serbilind dibûn. Peyre digotin: "Ma profesor jî bi kurdî diaxivin!" Bi kurtayî "çand û zimanê gundi û çiyayîyan" bû "çan- da şaristanî û pêşverûyan". Dîsa gelek tirk, laz, ereb û gurciyan li mala xwe MED-TV saz kir. Piştî ku lê temaşe dikirin, wan digot: "Ewqas jî demokrasî çenabe!"

Tîstê herî girîng MED-TV'ye sînorêñ psikolojik yê di navbera kurdan de hilweşan- din û kurdan di warê netewebûnê de gavêñ dîrokî û bikêrhafî hatin avêtin. Televîzyona neteweya bêdewlet, di mêjîyê kurdan de dewlet ava kir. Li çar aliyêñ Kurdistanê û cîhanê kurd li ber MED-TV'ye rûniştin û wan "Rê û Rê Kurdistan" nas kir. Yêñ ku hay ji A- med, Silêmanî, Mahabad, Dêrsim, Qamişlo û Dihokê nebûn, li wan bajaran "rêwîngîyen nîgaşî" li dar xistin. Édi peyvîn wekî "Kurdistana Tirkîye, Iran, Iraq û Sûriyejê" li ser zi- manan peya dibûn, Kurdistan bûbû ya kurdan. Édi wateya bakur, başûr û rojhîlat bû kur- dan dihatin wateyeke din.

Dîsa MED-TV'ye dor li "împaratoriya derewan" teng dikir. Ew qas jê ditirsîyan ku, bi mîlyonan dolar ji bo ku weşanên wê têk bibin, bi kar dianîn. Jixwe dema behsa kurdan dîbe, rayedarêñ tirk li berjewendiyêñ xwe yên aborî û siyasi jî nafikirin. Teoriyên çepgi- ran yên li ser serdest û birjuwazîyê li rewşa Tirkîyejê nayê. Lewre helwesta Tirkîyejê berberiyê (kan davası) tîne bîra mirov. Lî wekî gel gotiye: "Bila zilma wan zêde bibe, da ku zûtir têk biçin!"

Divê li ser qedexekirina Azadiya Welat li Kurdistanê jî çend tiş bêñ gotin. Piştî bir- yarê, serpêhatîyeke pêşengê şoreşa Bulgaristanê Dimitrov tê bîra mirov: Rojekê Dimitrov pê dihese ku rojnameyên birjuwayê pesna wan didin, yekser hevalêñ xwe li hev dicivîne û dibêjê: "Hevalno! Xuya ye me şâsiyek kiriye. Ji ber ku birjuwazî pesna me dide." Xu- ya ye em li ser riya rast hevalno...!



Çîroka gerîlayênu ku zivistanê 28 rojan meşiyane

Û me mirin dereng hişt

Di qefila şevê Araratê de
Bi qayış zexm disekekin xeyalênu me
Tofan û serma, berf û mirina spî
Di qijîna bahozê de.
Ararata bi melodî
Dilê Kurdistanê yî volqan
Di bilûra Şîvîn de Ararata daxdayî
Bilind dibe bi serê xwe
Bi tenê lê bi rûmet, bilind dibe bi
rehmet
Di lepê xwe de pêşkes dike mirinê jî
jiyanê jî

Li ber wî, hema li ber
qeraxa wî,
Malek bi yek şibakê
Wekî roniyek kûr di
parzinê şeva tarî...
Di hilatina rojê de û di
avabûna rojê de
Ya ku qûbla wê Ararat
e
Kalek, bi tevdana pe-
rengê tifîkê re
Qala Qûbeya ku ji
xwer e kirî cih dike.
Nalînek ji kûr tê, hem
jî ji nava dil
"Agirî ji me re mesken
bû, evîndarbûna wê
bi qasî hilkîşîna wê
kotek e"
Dibêjê û dîsa awirênu
xwe berî Araratê dide
Carna bi dila hildiki-
şîn wê bilindahiyê,
Bi hêvî, bi evîndarî û
bi tolhildanî...
Hin caran jî bi xey-
alan re, bi xewnan re
digîhîjin Araratê
Pîroz tê zanîn Ararat
Û ev pîrozî evîndar dike dilan
Ji Zerdûst tê.
Jiyanê
Di pêşkeskirina jiyanê de, hevdîtina
paşeroj û peşerojê ye
Oyy Ararat! Di qijînen şevê tofanî
de
Gewdîen hesretî zelaliya sibehek
germ
di rîwîngîya mirinê de, tu bi serê
xwe hiştin,
daxwaz tenê sibeheke zelal bû.

Te neda wan mizgîniya rojek bi ronî
Heyvî bi xwe jî roniya xwe neda.
Ma tu dexesi û te ew veşart?
An na tiştekî te dizanî hebû, ku nayê

zanîn...
Tu ku Araratî;
Bi her tiştî xwe ve bi rûmet û bi hey-
bet
Bi navê rûmetê, bi navê evîndariyê,
bi navê jiyanê
Ê ber bi te ve dimeşe
Di ber singa te de ber bi mirinê ve
tê kaşkirin
Bi dilê xwe yê hozanî, bi stranên
xwe yê berxwedan barkirî:
Şervanên nemir ku peşeroj dane ser
mil

xweşkahî, şînahî û rojê germ....
Helandina berfê û herikandina wê
yî seva Erezê
We pir ne dûr bane
Wexta şewqa êgir di çavênu me de
vîdiket
Me "Riya me dirêj e hevalno!" bi-
hîst.
Me bi êgir re cara dawî dîlan girt
û rîz bi rîz bûn di rî de
Bêdeng û tehna....
"Em li Çemçê ne"
Erez bêdeng, Erez ji her tiştî bêxe-

Ji tariyê sibê dizibû, sibehek bêroj
îro rojek ji rojên bêoxirî zivistanê
bû
Gîrîzonekek sar fitili li sûkra me
berfa ber ba dibû li rûçikên me di-
xist
Em di riya xwe ya çend rojan de hîn
bûbûn
Ser bêdil şewat bû
li mîjî û dilê me, şer dineqîşî tim i
tim.
Berxwedanê û îxanetê li hev didan
sîng bi sîng
Ê ku bi şer nedîwestiyan,
Ê ku bi çeka xwe bû-
bûn dostê axê
Revîbû bi tasek
şorbê....

Em di tevgeriyê de ne
Şîvîlê teng,
Her yek ji me bêdeng
gav diavêje
Em seatan, roja li hev
diqulibîn
Rê dirêj, rîwîngî westi-
yayî ye
An na emê bibezin pêş
de
Bi gewdîen xwe yêni ji
sermayê reş büyî, ê şe-
witî
Emê ji bo peşwazîkirina
rojê bibezin pêş de....
Çenâbe, em westiyayî
ne
Rojêni bi birçibûni, bi
bêxewitî têne qulibandin
Mîna kevirekî giran li
ser milén me....

Biparêze Ararat;
Bi navê Avesta ku ji Êgir hatiye ni-
vîsîn
Bi navê Zerdûst
Bi navê xwedayênu nas û nenas
û bi navê eşqa Kurdistan biparêze
Ararat!
(Li Araratê roj bi beşîsandina gerî-
la tê peşwazîkirin)
Navê me dineqîşîne.
Di destê me yî reşbûyî de kulmek
xwîn
Em bi çavênu xwe yêni xewokî difirkî-
nin
û em rojê bi içtimayê peşwazî dikin.
Di çaydankê reş de
Çaya ji berfê hatiye demkirin
Dema me li ber Agir qurt jê didan
me xeyal kir hatina biharê

ber e
Qet bêşaskirina rî,
Dîgîhîje evîna xwe, dîgîhîje wê der-
yayê
Mêrga avê, Gola Kupê
Di biharê de mîna xêliyekê dinuxu-
mîne
Çitîk ketiye çemê dîn dixemilîne
Kevz bi rengê qedîfeyî dipêçe
Şemîtok û nermik
Dengê me yî qutbûyî tevî çitîka bû
Li ba bû xeyalênu me.
Di bêdengiya Newala Kûr de
û bêdengî bi xwe re bêrîkirina den-
gekî tîne
(Em li Şenkayayê ne)
Qayış li şeva tarî
Roniya berfa Araratê peçabû

Dixwazim razêm a niha
Hema kîliyek jî be ez razêm
Bawer ke gavênu min hişk dibin
Bihêle hinekî razêm
Bila pênc deqîqe bin
Nebe pênc saniyan
Lê bila kûr be xewa min
Radikevîm, dayika min dîsa bang li
min dike
Bi nûkûrandin, bi gotina lorîkên
şînê....
Diveciniqim ji cihê xwe,
Da nebê xewa bê hayiyê
Wê dayika min careke dî min neyne
Di rojêni zivistanê reş de
(Dê bidome)

Li NÇM'a ïzmîrê

CALAKIYÊN HEFTEYÎ



● 17.10.1998 şem: Konsera Koma Agirê Jiyan, saat:18.00

● 18.10.1998 yekem: Konsera Koma Agirê Jiyan, saat:15.00-18.00

● 19.10.1998 duşem

Bi Koma Agirê Jiyan ra gotûbêj, saat:18.00

YÇKM

● 18.10.1998 yekem, Konsera Grup Munzur
saat:16.00

Navenda Çanda Tohum

● 18.10.1998 yekem: Panel: Şoreşa Cotmehê

Beşdar: Rojnameya Atılım, Rojnameya Özgür gelecek, Rêxistina ÖDP'e ya Stenbolê, Navenda Çanda Tohumê

lileri Gözelleme Kültür ve Sanat Evi

● 28.10.1998 fin:

Lîstika bi navê "Amade be". Derhêner: Aziz Nesin
saat:18.00

Welat li ïzmîrê bi navê "ziman û netewe" panel li dar xist

Tevgera siyasî ji nirxên neteweyî hêzê distîne



Nûnergeha Azadiya Welat a ïzmîrê roja 10'ê kewçerê li salona NÇM'ya ïzmîrê panelek li dar xist. Di panela ku bi ser-navê "Ziman û netewe" pêk hat de Ziman-zan-lêkoliner Dr. Ali Rıza Aslan, Niviskar-lêkoliner Mustafa Borak Gerfinendeyê Giştî yê Azadiya Welat Sami Tan wekî axivger besdar bûn, her wiha nêzî sed kesi besdarî di panelê de kir.

Panelîst bi giştî li ser netewebûnê û girîngiya zimên sekinin. Dr. A. Rıza Aslan li ser mercen netewebûnê da zanîn ku çar mercen netewebûnê yêngîn hene, ku ji van yek tenê jî kêm be qewmek nikare bibe netewe. Aslan mercen netewebûnê wiha rêt kir; ziman û welat, çand û dîroka hevbes û aborî. Aslan da zanîn ku mirov nikare al û olê wekî mercen netewebûnê yêngîn bîhesibîne. Ji ber ku ev, li gorî demê diguherin. A. Rıza Aslan di nava axaftina xwe de li ser têkiliya ziman û netewe, têkiliya zaravayan û siyasetê rawestiya. Wî got ku ziman girêdayî ramyariyê ye, ziman û raman bêyî hev nabin. Dema ziman nîn be mirov nikare bifikire, dema raman nîn be jî ziman pêk nayê. Dr. Aslan diyar kir ku di pêşveçûna mirovahiyê de du hêmanên bîhezin ziman û dest in.

Di warê têkiliya zimên û siyasetê de jî A. Rıza Aslan ev nirxandin kir: "Heke siyasetek tune-be ku rê li ber zimên veke, ew ziman jî wê win-da bibe." Aslan, li ser zaravayan jî dîtinê xwe wiha derbirin: "Zarava bi tu awayî nabin asteng li ber netewebûnê, lewre di hemû ziman de zara-va hene. Her wekî ji peyvê jî xuyaye zarava, a-wayê zar in, ne zar in."

Di panelê de Niviskar-lêkoliner Mustafa Borak bi piranî li ser ziman, wêje, çand, folklor û zargotina kurdi sekînî. Borak got ku axaftin û

xwendina bi zimanê zikmakî ne mafekî demokratik e, mafê jiyanê ye. Borak di dawiya axaftina xwe de bi mînakên ji gotinê pêşîyan û stranê gelêrî têkiliya xurt a di navbera ziman û zargotinê de destnisan kir.

Di panela "Ziman û Netewe" de axîfgerê sîyemîn Gerfinendeyê Giştî yê Azadiya Welat Sami Tan, bi awayekî giştî li ser nirxên neteweyî û netewebûnê, zimanê rojnamegeriyê û pêwîsiya xwendin û nivîsandina bi zimanê zikmakî sekînî. Wî da zanîn ku di netewebûna gelên bindest de hêza diyarker rêxistina politik û têkoşîna rêkxitinî ye. Ji bo selmandina vê dîtinê jî wî rewşa gelê kurd a berî Tevgera Azadiyê û ya piştî vê tevgerê nimûne da. Lî wî diyar kir ku tevgera siyasî jî ji nirxên neteweyî hêz û quwetê distîne.

Gerfinendeyê Giştî yê Azadiya Welat Sami Tan go-tina xwê wiha domand: "Mirov nikare nirxên neteweyî ji hev dûr bixe an jî di ser hev re bigire, hemû bi hev ve girêdayî ne." Sami Tan xwest ku rewşenbîrîn kurd dev ji gotina bi şeweyê "bazara zimanê kurdî kesad e" berdin.

Tan, li ser mijarê ev nirxand kir: "Bi vê ramanê kes nikare tiştekî bi dest bixe, rewşenbîrîn ku tevgera bi milyonan li pişt be, divê dev ji vê dîtinâ çewt berdin. Lewre dema mirovîn rewşenbîr û xwendevanê weşanên kurdi dilsoz bin, dê bi xebateke gur, encamên geleki baş bi dest bi-xin."

Panelîstan da zanîn ku hebûna zaravayan dewlemeñdiya zimanê kurdi ye, êdi lîstikên dijimin ên di vî warî de têk çûne.

Di dawiya çalakiyê de kesen besdar, li ser mijarê ramanen xwe anîn zimên û bi pirs û bersivan panel bi dawî bû.

DAVUT ÖZALP /A.WELAT ÏZMİR

TİŞK

EZ DIZ A HA !



LERZAN JANDIL

Dîroke de serê hardan ra mordemî est bî ke, dizd bî û dizdiya xo zê mêziyetêde manqûl zanitêne. Nê mordemî şarî, kesanî bînan ebi dizdiya xo tersnenê û vanê: "Qayte ti ke rehet me-vindê, yan jî vatena mi mekerê, ez malê to tirena." Bê guman na seba nê kesan nê bêahlâqî ya, ne jî çiyêde teberê mordemâti yo. Wurnciya dîroke de sarê hardan ra mordemî ke mîkkuiya xo, talan û bandor kerdena şaranê bînan zê huner, zanitêne û hêni jî dênen şinasnayene. Seba naye ma ke dîroke de şaranê bînan niyadeime, naye areste vînîme. Mordemî, şarî û dewlettî est bî, ke xultiya xo, koletiya xo, girêdayiya xo ebi paşayan zê durisiye, zê dilsoziye zanitêne û hêni jî hêni jî dêne zanayene. Zê kes û şaranê bindestê osmaniyan. Paşa her çî bî, şar û kesî qulê paşay bî û ganî ïnan qultiya xo de quisî me-kerdene. Naca çiyo tewr balantox o wo, ke nê mordemî, şarî yan jî dewlettî eke xurt û zixm bê, ere xo bawer bê, nê çiyî kerdê yan jî kenê. Eke rexo bawer mebê "birakê maya xo ra vanê bawo!" No jî qederê karekerê nînan biyo/o.

La belê ewro roj û dem verdo ra. Kes, şar û dewlettê ke avêriyena mordematiya ra, heq û hiqûq însanetiye ra para xo gureta, ebi dizdiya xo, ebi kîstenanê xo, ebi talan û xirabekerdene xo, ebi qultiya xo kîfweş niyo, nînan zê meziyetan qebûl nêkeno.

Hama tam jî naca çiyêde ters esto. Osmaniyan ra bigêrê hetanî ewro, "Dewleta Tirkîye, yan jî idarekerdoxê daye." Ti vana qey vê keme-re quer a, qe çiyê pé nêhesîna, qor a nêvînena, lala qesê nêkena.

Ewro jî zê demanê verî duşetê cîrananê xo boruzaniya lecî kena. Ewro jî zê demanê verî hemverê şaranê bîna, şarî ma, şenikiyanê miyanê ma dişmentiye û zordariye kena.

Eke yew kes jî çiyê vaco, vana: "Qayte ez gîrsîri ya, qewetêri ya, hundê leşkerê mi esto, dîroka xo de mi hunde dewlettî rîjnê, şarî, şenikiyî, dînê qedêne, ez to jî hal kena ha!"

Nê rojanê pênyiye Tirkîye dest kerdo ci, hetê ra wazena êrîşê Sûriye bikero, hetê ra qetîlamanê xo welatê made kena xurt û hetê ra jî êrîşê Televîzyonê Medî kena. Sero pêyên de jî dewletanê ereban tehdîd kena, wazena ïnan bitersno. La belê qeyî? Eke mordem cewabê persanê cêrenan bidêro, no "Qeyî" yê naye zaf rehet êno famkerdene.

Ma vacîme, ke vatena cumhuriyetê Tirkîye raşt a. Yanê koka "terorî" Sûriye de ra. Ma şima hetanî nika, na 14 serî yo katî bî? Şima qeyî luzim di, İsrail de peymanê neweyî virastî? Şima qeyî meseleya çete-yan, vetena kasetan ra tepiya hemverê Sûriye dest bi vetana lecî kerd?

Yan jî gîrsîya şima, qeweta şiman îndî nêşona kurdan û şima wazanê ebi hetkariya İsrail û Amerîka hem kurdan û hem jî cîrananê xo biqedênen? Yan jî şima fam kerd, ke no lecî şima wo ke hemverê kurdan de 14 serî yo ke dewam keno, beyhûde wo. Ü ebi metodanê neweya şima wazene ke qeweta xo ya mîltarîzîmî newe ra bîmusnê şaranê ma? Yan jî dewam, vila û hîrakerdena lecî de menfaatê şima estê?

Yan jî îndî îktîdar de partiyede sivîle, zê Özalî, çîna. Partiya leşke-riye, yanê partiya ordî esta. A jî tenya maşqî lecî ya? Ma şima lîthât Terakî ra nat no cerebna se bî? Ganî pirnika şima bisuyo hard ra. Ganî dewlet û şarî bîmî şima biyarê re çok. Hetani pirnosê şima hart ra mesyo, şima mordem nêbenê, şima sîvîlîzasyon, heqê mordematiye û şaran, demokrasî û yewbiyene ra çiyê fam nêkenê.

Hesenê Mûsa û Hedoka Qaso

Destana Hesenê Mûsa û Hedoka Qaso, destana evîneke dîroka nêzik e. Mirovên ku bûne şahidê evîna van herdu ciwanan, bûyer ji serî heya binî ji zarokên xwe re gotine. İro ew zarok bûne kal û pîrên heşte sale. Du kes ji wan; Apê Hisêñ û Pîra Zeko ne. Ev herdu mirov jî dibêjin, "Em bi kilama Hesen û Hedo mezin bûne û dema ku em zarok bûn dê û bavêne me bûyer ji me re vedigotin me li wan guhdarî dikir. Bi rastî em herdu ji di bin tesîra wan herdu qız úxortan de mabûn ku me jî dil xistibû hevû din: Apê Hisêñ û Pîra Zeko herdu jî ji Biloka, Ango ji gundê Hesenê Mûsa bi xwe ne. Biloka gundê Qosera Mêrdinê ye. Di destanê de navê gund car caran derbas dibe. Jixwe bûyer jî li Biloka diqewime. Gava ku mebihist ev herdu pîr û kalê delal ji Biloka ne, me xwest ku ji devê wan vê destanê hîn bibin û em li ber çonka wan rûniştin me guhdêra. Apê Hisêñ cihê xwe xwes dike û dest pê dike. (Yek caran Pîra Zeko jî beşdarî nav gotinê dibe û bi bihistinê xwe çirokê dixemiline.) Belê gotinê stranê ew qasî nedihat bîra wan. Jixwe gotinê stranê gelêri ne. Apê Hisêñ dibêje: "Hesen û Hedo ciwan in. Dilê wan dikeve hev û din. Hesen çend caran dê û bavê xwe dişine ku jê re Hedo bixwazin. Bavê wê û birayê wê dil nakin. Dibêjin "Hesen şivanê gund e. Çi Hesen heye ku em qîza xwe bidine Hesen?" Lî dilê dêya keçikê heye bebê ji tîrsa re nake der. Ew jî li cem mîre xwe cih digire. İcar Hedo diçe cem do labrêsan û keçikên gund rûdinê û wila dibêje:

Hey wax li min hey wax li min mala minê

Yadê yabo Hesenê mala Mûsa min dixwaze min bidinê
Mane sola Hesenê Mûsa qetiyaye yadê cûnhatinê

Bila qeda bikeve zewaca bêdil mîr û jînê

Yadê yabo heke hûnê min bidinê min bidinê

Belê ku hûn naxwazin min bidinê

Ezê herim Diyarbekira şewitî ser bo yaxeh reşkirinê

Min û hesenê Mala Mûsa daye soz-qerarêñ revandinî

Hesen xortekî bedew e. Mewîja res di qirika wî de xupa dike. Lî çi fêde malbata wî xizan û belengaz e. Qedr

û qîmetê wî li cem bavê û birayê Hedo nîne. Ji aliye din ve Hedo bi ser Hesen de dimire, dibêje, "ji xeynî Hesen ez tu mîran nakim." Hesen û Hedo yek caran bi dizî têne cem hev û din, derd û xemêne xwe ji hev û din re dibêjin. Malûm e gundî û cîran dibîhîsin xeberê didine bav û birayê Hedo û fesadî û gelaciyan dikin. Navê birayê Hedo Simko ye. Simê Qaso û Derwêş Cafo destbirak in. Derwêş ji xafil de li me teqîyan

Simkê Qaso û Derwêş Cafo bûne wekî wahşen nav deviyan

Dîna min dît Hesenê Mûsa bû wekî beranekî pez kovîyan

Li ber çavê min rebenê di

nava avête ser guliyani

Min got Hesen rabe, morî û mer-canêñ stûwê min qetiyân

Hesen rabû yeko yeko libo libo ber-hevkir û lê geriyan

Yadê yabo ji aliye Xaroka xopan der-bek ji xafil de li me teqîyan

Simkê Qaso û Derwêş Cafo bûne wekî wahşen nav deviyan

Dîna min dît Hesenê Mûsa bû wekî beranekî pez kovîyan

Li ber çavê min

rebenê di

nava

Yadê yabo Hesenê Mala Mûsa bilür-van e

Tizbiya Hesenê Mala Mûsa kehrîban e

Sola Hesenê Mala Mûsa reş e bi qey-tan e


Qesasê Hesenê Mûsa Derwêş Cafo û Simkê bira ne

Ji bo Xwedê hûnê wî nekujin, Hesen pir ciwan e

Hûnê nekujin Hesenê Mûsa mîrê bi sed mîran e

Hey wax li min mala minê

Heyfa Hesenê Mûsa, ne m ê r ê kuş-



xwînê de digeriyan

tinê ye

Hesen heyla qurba ji kîfâ dilê min û te re çiya bang kir çiyan
Biçük û mezinê gundê me derketin çûn mazîyan
Ji cem rebê izetê de ewr û tavan li me geriyan
Ji ezamê jorî de baran dibariyan
Min û Hesenê mala Mûsa xwe avête bin deviyan
Me ji xwe re bi evînî dest avête kîf henek û lagirdiyan
Hesenê mala Mûsa nefstenik bû dest

Gava ku derbekê duduyan berdi-din, Hesen birîndar dibe. Simkê Qaso dibêje "Cafo! rabe me Hesen birîndar kir. De ka em herin ser, heke ku birîna wî xedar be dê em wî bikujin. Lî belê ku birîna wî ne xedar be dibe ku bifilit. Welehi ku Hesen nemire, dê me herdukan jî bikuje." Çilo ku Simkê Qaso û Derwêş Cafo ji kemînê derkevin. Hedo xwe bi ser Hesen de davêje û wilô dibêje:

(DÊ BIDOME)

BERHEVKAR: ADAR JIYAN

Ji Nûbiharê dosyaya Seyid Evdilqadir

Kovara Nûbihar bi hejmara xwe ya 65'an derket pêşberî xwenâ devanê xwe. Di vê hejmarê de bi dosyayekê têrtijî û berfireh li ser Seyid Evdilqadir Şêx Ubeydullahê Nehri hatiye rawestandin.

Süleyman Çevik, Xelil Dost, Feqî Huseyn Sağrıç, Memê Alan û Müfit Yüksel ku bi nivisên xwe li ser Seyid Evdilqadir rawestiyane cih digirin. Her wiha li ser heman kesî bi lêkolîner û niviskaren wekî Rohat Alakom, Naci Kutlay, İsmail Göldâş û Hasan Yıldız re hevpeyvîn hatine çêkirin. Di nivisa Süleyman Çevik de qala hevdîtina bi Xidir Geylanî re ku neviyê Seyid Evdilqadir e, demeke dirêj li Amerikayê maye û piştire jî li Tirkîyeyê wekî midûrê giştî ji Sümberbankê malnîşîn (teqawid) bûye, tê kirin. Wisa xuya dike ku heta ev hevdîtin pêk hatiye xwediyê nivisê ketiye nav keftûleft û têkiliyên dûvedirêj, zehmetiyên giran kişandine lê ew ji mala Xidir Geylanî destvala vegeriyaye. Lê serpêhatiya niviskar bûye mijara nivisê.

Xelil Dost bi sernavê "Seyid Evdilqadir kî ye" bi kurtasi li ser jiyanâ wî radîweste û diyar dike ku wî di sala 1918'an de tevî çend hevalen xwe

"Kurdistan Teali Cemiyeti" ava kiriye û bûye serokê vê saziyê. Li gorî nivisa Xelil Dost, Seyid Evdilqadir di dema Osmaniyan de çareserkirina pirsa kurdî di çarçoveya sazûmana xilafetê û yekparetiya Osmanî de didit. Lê piştire ji ber ku Komara Tirk xilafetê radike û dest bi pergâleke nijadperest dike, ew jî dest ji ramana xwe ya "Otonomiyê" berdide.

Dr. Naci Kutlay, di hevpeyvîna ku li gel wî hatiye çêkirin de, diyar dike ku li Stenbolê bi hejmareke mezin qala kurdîn ku ji feodalîyê hatine lê xwende, zana û nûjen in têne kirin. Tê gotin ku Seyid Evdilqadir yek ji wan kurdîn hevî navdar e. Kutlay qala arşîvîn salê 1921-1922'yan dike ku Seyid Evdilqadir li diji parvekirina Kurdistanê derkekiye û ji Konferansa Parisê re name şanidiye ku parvekirina welatê wî, ew gelek xemgîn kiriye. Naci Kutlay dide zanîn Seyid Evdilqadir xwestiye ku Kurdistan bi hev re be lê di bin destê dewletekê de be (Osmanî Frensi an Ingîliz ne giştî e) û ew bi xwe jî serok be. Her wiha Kutlay navê "ingîlîzcîti" yê ku M.Kemal bi pey Seyid Evdilqadir xistiye, tasdiq dike û diyar dike ku wê demê hemû

hêzîn dijber bi îngîlazan re têkilî danîne, lewre ew xurtirîn dewleta li ser rûyê cihanê bûye.

Feqî Huseyn di nivisa xwe de serdanpê jiyana Seyid Evdilqadir radixe ber çavan. Şayanî gotinê ye ku nivis pir zede ji pesindayînan pêk tê. Nivis di dilqê serpêhatiyê de hatiye ristin.

Li aliye din Rohat Alakom bi zimanekî akademîk li Seyid Evdilqadir radiweste û agahiyê balkêş dide. Ew di nivisa xwe de diyar dike ku di destpêka sedsalê de li Stenbolê 30.000 kurd hebûne û 15.000 ji wan endamên "Kurdistan Teali Cemiyeti" bûne û Seyid Evdilqadir ji serokatiya wan kiriye.


İsmail Göldâş di nivisa xwe de berevaji Naci Kutlay "ingîlîzcîti" ya Seyid Evdilqadir red dike û dibêje ku ew ne xulamê ingîlîzan e. Göldâş ji bo têkiliya Seyid Evdilqadir û "Cemiyeta Azadî"

dibêje ku di wî warî de gelek nîqaş û gengeşî çêbûne û mensûbiyeta wî ya Cemiyeta Azadî meseleyeke resmî ye.

Li aliye din kovarê ji secereya Malbata Nehriyan re rûpeleke xwe vejetandiye. Wisa diyar dibe ku Nûbihar divê hejmara xwe de ji bili nivisên dosyayı dest bi nivisên din jî kiriye. Wekî mînak Zeynelabidîn Zinar bi nivisa xwe ya bi navê "Gurê Manco", Hilmi Yeşiltaş ji bi nivisa ku navê wê "Ey Nazenîn!" e, di rûpelên kovarê de cih girtiye.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ


Nûbihar
MEHNAMEYA ÇANDI HUNERI EDEBİ



**Serokê KTCê
SEYID EVDILQADIR**

Kongreya Mezin a HADEP' ê

OSMAN ÖZÇELİK



Kongreya Mezin a Sêyemîn a HADEP' û di yekê meha sermawêzê de wê li dar bikeve. Kongre, di van rojên dîrokî de li dar dikeve. Ji ber vê yekê kongreya sêyemîn, ji kongreke rêtê cûda dibe û balê dikşîne ser xwe. Ez bawer im di dîroka kurdan de, dê geleki behsa van rojan bibe. Ji ber ku, cara yekemîn e ku li başûrê Kurdistanê şanseke federasyonê derkekiye holê.

Başûriyan bi xwe jî heta îro daxwaza federasyonê nedikirin. Daxwaza wan "li Iraqê demokrasî, ji Kurdistanê re muxtariyet (özerliklîk)" bû. Nakokiyên navbera Amerikayê û Sedam, Amerika anî heta vê niqteyê. Di vê yekê de Washington çiqas samîmî ye, ci qas ji dil vê dozê dike, em pê nizanin. Ji ber ku em dizanin hêza Amerikayê heye ku vê daxwazê di rojekê de bi cih bîne. Belê nake. Bike jî û neke jî, ji bo Kurdistana Başûr riya dewleteke federasyonê vebûye û xuya ye dewletê dînyê dijberiya xwe eşkere nakin. Sedema dîn û harbûna

Enquerê jî ev e.

Di vê pêvajoyê de rewşike balkêş a din jî ev e: Tirkîye bi awayekî zimmî, PKK ne mîna rîexistineke terorîst, mîna rîexistineke siyasi qebûl kiriye. Berdevkîn dewletê yêne fermî, êdî nabêjin em serê serokê PKK'ê dixwazin. Tirkîye bi Sûriyeyê re hatiye ber şerekî mezin. Hate dîtin ku Sûriye û Hafiz ne bi qasî dihat gotin; bêhez, tirsonek û bi tenê ne. Berê, serê Serokê Partiyê Karkeren Kurdistanê dixwestin, dîtin ku bi dest wan nakeve rû badan, êdî dibêjin bila ji Sûriyeyê derkeve û biçe dewleteke sêyemîn, ku ji Tirkîye dûr e. Ne tenê Öcalan. Ew û hevalen xwe bi hevdu re. Ango gerîla jî dikare bi dûr bikeve. Ev pêvajoyeke nû ye û zehf giştî e. Ev qebûlkirin e. Ev naskirineke zimmî ye.

Ev formûlasyon bi me xerîb nayê. Formulasyona Israîl û Filîstînê jê dişibîya vê. Filîstînî di Lubnanê de bûn. Lubnan bi piranî di kontrola Sûriyê de bû. Filîstîniyan ji Lubnanê êrîşî Israîl dikirin. Israîl xwest ku Yaser Arafat û gerîlayen Filîstînê bi keştiyan biçin dewleteke din û wisa jî bû. Gerîlayen Filîstînî li bakurê Afrika û li Ewrûpa belav bûn. Pêvajoya dîplomatîk destpê kir û paşê Yaser Arafat çû li ser maseya peymana aştiyê rûnişt.

Sara deriyê şer şikestiye û riya aştiyê xuya bûye. Divê em vê pêvajoyê qenc binirxîn. Ne serxweşîya serkeftinê û ne jî redşîtin. Tenê aqil, tenê zanebûn. Politika û şer ne

lîstika zarakan e.

Kongreya HADEP'ê perçeyek ji vê pêvajoyê ye. Cara yekemîn e ku HADEP dê beriya kongrê, konferansekê li dar bixe. Wê nûnerên partiyê li ser problêm navxweyî rawestin û wê li ser zelalkirina dîtin û ramanen xwe yên politîk biaxivin.

Di warê jiyanâ politîk a legal de; HADEP ji partiyen me yên din temendirîtir e. HEP du salan, DEP salekê, ÖZDEP nîv salê jiya. HADEP ketiye pêncsaliya xwe. Jiyana partiyekê wekî HADEP'ê bi lêxwedîderkeretina endam, rêvebir û gel dirêj û geş dibe. Gel li HADEP'ê xwedî derdikeve. Rêvebirê Partiyê tênu kuştin jî, cihê wan vala namîne. Roj bi roj Partî fireh, xurt û bi tecrube dibe. Her ku diçe Partî ji gel re dibe hêvî. Di kongreya duyemin de, coş û heyecaneke mezin hebû. Li dor sî hezar kes besdarî kongreyê bûbûn. Di tu kongreyê partiyen dewletê de ew qas mirov nehatibûn ser hev. Mixabin kongre; bi zanebûn an bi nezanî provoke bû û partiyê xesarek mezin dît.

Di vê pêvajoya dîrokî, ya ku gelê me kefenê mirinê diçirîne de, çavên dost û dijminan li ser gelê me ye. Çavên gel jî li HADEP'ê ye. Divê herkes di vê bîrê de be û HADEP'ê biparêze.

De, ji îro de cilên xwe yên herî nû û paqîj amade bikin û mîna hûn diçin dîlanê biçin kongreyê.

Xalê Hesen

Aalê Hesen li kerê xwe siwar bûbû û kolan bi kolan digeriya. Li dûv gelek gerê mirovek rastî wî hat û got:

- Tu çi li digerî Xalê Hesen?"
- Xalê Hesen ê ku li kerê xwe siwar e, bersivê dide:
- Wele kerê min winda bûye, ez li kerê xwe digerim.

Zirîna mirovekî

Yekî kal ji gundê Sêrtê diçe bajêr. Li bajêr rastî zarokekî tê û dînihêre di stûyê zarok de zincîreke zêrîn û di destê wî de jî saeteke xweşik û zêrîn heye. Mirovê kal difikire û dibêje:

- Ez çawa wî bixapînim ku zincîr û saeta wî jê bistinim.

Piştî ku fîkrîne kurt, bangî zarok dike û dibêje:


- Ka were, em herin dikanê, ez ji te re topek û dondirmekê bistinim. Tu jî wê saet û zincîra xwe bide min.

Dîçin dikanê û vedigerin, zarok dîbêje:

- Ez ê saet û zincîra xwe bidim te lê şertî min heye?

Mirovê kal hînek difikire û dibêje:

- Baş e. De bêje ka şertê te ci ye?



BI XELAT...

XACEPIRSA BI XELAT (141)

XACEPIRSA

Şehidek wêne)	Naveki mîran	Gihanek	Herêm fbere pa şki)	Medenî	Herêmeke kurdistanê
Şehidek wêne)	Naveki mîran	Gihanek	Herêm fbere pa şki)	Medenî	Herêmeke kurdistanê
Şehidek wêne)	Naveki mîran	Gihanek	Herêm fbere pa şki)	Medenî	Herêmeke kurdistanê
Şehidek wêne)	Naveki mîran	Gihanek	Herêm fbere pa şki)	Medenî	Herêmeke kurdistanê
Şehidek wêne)	Naveki mîran	Gihanek	Herêm fbere pa şki)	Medenî	Herêmeke kurdistanê

Bersiva Xacepirsa 139'an

GELERİ III



Xacepirsa me bi xelat e.

Di 15 rojan de ci bersiv bigihêjin destê me, em dê wan binirxînîn û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 142'yan Kaseta Stranê Gelêri 'III' ye

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Vêşarî" di nava qutiyêni li bin xacepirse de binivîsin û tevi navmîşana xwe ji me re bisînin.

Pênc kesên ku xelata hejmara 140'ı Kaseta Seid Yusif qezenç kirine ev in: Emîne Dağ/Stenbol, Mehmet Uğras/Stenbol, Seferi Yılmaz/Stenbol, Bülent Akdağ/Wan, Yusuf Bulut/Tokat,

Şehidek wêne)	Naveki mîran	Gihanek	Herêm fbere pa şki)	Medenî	Herêmeke kurdistanê
Şehidek wêne)	Naveki mîran	Gihanek	Herêm fbere pa şki)	Medenî	Herêmeke kurdistanê
Şehidek wêne)	Naveki mîran	Gihanek	Herêm fbere pa şki)	Medenî	Herêmeke kurdistanê
Şehidek wêne)	Naveki mîran	Gihanek	Herêm fbere pa şki)	Medenî	Herêmeke kurdistanê
Şehidek wêne)	Naveki mîran	Gihanek	Herêm fbere pa şki)	Medenî	Herêmeke kurdistanê

PEYVA VEŞARÎ



Zarok dibêje:

- Divê tu wekî keran sê caran biziri. Zilam mîna keran sê caran dizire.

Zarok lê vedegere û dibêje:

- Xalo ma tu ker î, tu zanî saeta min zêrîn e û ma ez çîma nizanim?

Berberxane û qesab- xane

Mirovek dixwaze ku here berberxaneyê, ji ber ku cihê berberxaneyê nizane, diçe qesabxaneyê.

qesab dibêje:

- Kerem bike.
- Ez hatime rûyê xwe û serê xwe bidim kurkitin.

Qesab dest davêje şerfeke mezin (Kêreke mezin) ber bi wî ve diçe.

Mirovê kal: "Tu yê ci bikî?"

Qesapkar: "Ez ê serê te bitraşînim." Mirovê kal ditirse û direve.


BERHEVKAR: KAZIM EKİNCİ

Kur û bav

Kur ji bavê xwe dipirse:

- Bavo! Ez kurê kê me?
- Tu kurê min î.
- Ma bavo, wê çaxê çîma diya min ji min re dibêje: Kurê kerê.

ENISE SÜER



1 2 3 4 5 6

Homê homan û kerdenê dewleta tirk

Eke şarê xoya û eke neteweyên çosmedê xoya ebi aşitiya qe meseleyê jî awa nêkerdo. Problemên xo, ebi qiwetê leşkeriya hal kervo. Çimke kulturê ci, kulturê eskerîn o. Kulturê eskerîn de jî, esker qandê weşîna şarî nê, şar qandê weşîna eskerî esto, esker jî şarî ra zaf terseno.

Dewijan miyan de wexto ke teşxeyê vejyeno werte, heme çî kewno pêmiyan û kes kesî ra çiyê fahm nêkeno. Vaten û kerdiñ qe pê nêtepşenê. Vengê kamî pehêta vejyeno, şar verî goş dano ey. La belê kes fina jî wayirê vengî ra tebayê fahm nêkeno. Welhasil peyniya, qisanê veng û valan de destî şinê vera çiweyan. Wexto ke teprep çiweyan ra yeno, no fin ti ewnenê ke jew dewij vejiya werte û wina qîra. "Vindrê! Vindrê! Ma veydê homê homan û piyê aqil û fahman. Wa rayê bido ma ver." Homê homan û piyê aqil û fahman ci ray bido dewijan ver, a ray heminan rê jî bena raya rast û çiweyî jî pey ser kewnê cayê xo. Dewleta tirk jî bin ra hetanî ser, zey na dew amewa ro. Ewro ma ewnenê ke kes kesî ra qe çiyê fahm nêkeno. Homê homan jî nêşeno qandê rewşê na dewleta dewijan fikrê biyaro ziwan.

Meng û nîm ravêrd ke PKK kewto adirbirnayinê lecî. Nê wextî miyan de, bê xo parastinî, gerîlay jew gule jî nêteqna. Dinyayî dî ke kişa kurdana lec nêwazena û çend ke kurdan dest ra yeno jî iyê destê xoyê biratey û aşîtwazî kenê dergê dewleta tirk. Hem ze-re de û hem jî teber de, qe merdimê jî nêşeno vajo "kurdê neheqey kenê". Ewro temamê dinyayo jî heq dano kurdan. Na heq-dayina kurdan hetek de dewlet tirkî se (çiçî) kervo û qandê ci ma şenê se vajim.

Artêşa tirkan herêm de operasyonên leşkerî qe nêvindernê. Operasyonê herî girdî jî eyaleta Dêrsim, Botan, Amed, Garzan û Tolhildanî rê vi-rastî. Nê operasyonan de xeylê gerîlayan weşîna xo vinî kerd. Ebi desana dewî kerdî veng, bax û baxçeyen kurdan veşnayî, işkence û zilmê xo dewijan sero hevynâ kerd berz. Ebi haza-rana leşkerî, topî, tanqî riştî başûrê Kurdistanî. Bombekeardinê teyeran û helikopteran qe kemî nêbî.

Mitingên HADEP bêsebeb qedexe kerdî. Nêvirada şar vejiyo kûçan was-



tanê xoyê biratey û aşîbiyaro zi-wan. Her roj endam û serdarê HADEP girotyay binçim û heveyê jî çebiyay hepis. Nêvirada jew aşîtwaz çimê xo akiro. Stenbol de zilmê polisan Mayanê Şemî sero qe kemî nêbi, heta ve-rîra bi vêşî. Her hefte zey wahşan Mayanê Şemî rê vardayin viraşt û may gi-roti binçim û haqtê ci de dahway abi-yay.

Vardayinî bî veşî

Eywanê Navenda Çanda Mezopotamya û Alternatif Kültür Merkezi rachenay. Şaxê NCM ê Amed û Riha kok ra girotyayî. Roja sifteyin ra heta ew-ro, nêviradayî rojnameya Ülkede Gündem dekewo şaristanê kurdan bahdoyê adirbirnayinî vardayinê xo verî ra kerdî vêşî. Her gi roj jew vilakarê rojnamey girotiya binçim û san-sûr jî verî ra xeyle kerd veşî. Peynî de jî, rojnamewo ke nika şima destdino Waliyê Rewşê Awarkey (OHAL) bajarê ke sînorê Rewşê Awarkey miyan-de ca genê ê bajaran de (Amed, Sîrt, Şîrnex, Culemerg Wan û Dêrsim de) kerd qedexe. Ancî çend rojî yo dewleta tırka qandê vera weşanê MED-TV girotin sînyal rêsena Stalîteyê ci. La belê çend rojî şerî senî kerd (bê çend de-qan) nêşa verî weşanê MED-TV bigi-

ro.

Ewro jî Sûrî ra herb wazena. Dewleta tirk Sûrî rê vanâ: "Ya Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî bide ma, yan jî mayê to ro dê. Eke ma finê dest hewada, peyniya to ami." Ti vanê qey awa qahriyana qeçikan ra. Çimê ci wi-nî biyê sûr ke, awa verê xo nêvînena. Na dewlet qandê çicî hendayê biya xînt û bêaqil, qandê çicî adirbirnayinî peyra hendayê biya çimsûr. Wexto ke ma ewnenê dîroka na dewlet aşanenê, qe cayê de jî rastê aşîti nîme. Eke şarê xoya û eke neteweyên çosmedê xoya ebiasiyya qe meseleyê jî awa nêkerdo. Problemên xo, ebi qiwetê leşkeriya hal kervo. Çimke kulturê ci, kulturê eskerîn o. Kulturê eskerîn de jî, esker qandê weşîna şarî nê, şar qandê weşîna eskerî esto, esker jî şarî ra zaf terseno. Wexto ke selameteya şaran yeno ziwan, zerya eskeran visyeno. Tersê eskeran, netewê winayinan bawerîn ra, aqilin ra û aşîti ra xeyle kewno dûrî. Coka jî dewleta tirk nêwazena me-sele jî ebi rîndeya çareser bibo. A bê pirodayinê qe çiyê ra jî fahm nêkena. Çimke xusetê ci, xusetê eskeran o. La belê ebi nê xusetiya jî qe çiyê ser nêkewno. Dûrî nezdî, na dewleta ney fahm bikero.

ZÜLKÜF KİŞANAK

DEWIJAY RA REYAYIN Û VERVİ SÜKJAYA

Xeylê wext bi mi nê hurdina vatenî aşnawitê. Her çend di kovaran de, di rojnameyan de, min wend. Ney ra tepiya qandê nûştişî zî mezgê min xeylê meşxûl bi. Welatê ma de, no esto wexto ke, ti wazanê jewî bisilasnê. Persa ma ya verin zî na ya: "Ti kamcîn dewra yê?" Ezo wazena na mijar ser ro yanê dewijay û sükjey sero vinderî. Dewanê ma de zey dewanê şarî dibistanî, kargehî û pirtûkx-anne zî çînyo. Ewro dinya werdî biyo û ma ney rind zanê ke, heme dewletan miyan de, no esto ke, her dewlet qandê mileta xo planê ci zî estê. Ma şenê ney vajê ke, planê ma zî çînyo. Bê planeya mileta ma, heme kiştan ra ma peyde verdayo. Heme çî bi zanayina beno. Wexto ke merdim zana bo û o wext heme karê merdimî zî beno rehet. Di welatê ma dê, hewna fikrê dewijay yeno ramitiş. No karê zor û zahmet zî xoya piya ano ma vernî.

Dinya de heme merdimî wayirê jew mezgî yo. Kes wayirê çend mezgan nêbeno. Kemî-vêşî her merdim mezgî xo bi karano. Ma vînenê ke, dewê ma, sûkanê ma zey dewanê û sûkanê şarî niyê. Ewro lazim o ke ma xo ra bipirsê û sebebê nê karî çicî yo?

Di tarixê ma de, no jî esto û mi rê çicî? Dewijay û sükjey ra ma çicî fam kenê? Ma do derdan û kulanê xo rindêr û weşer bicanê. Lazim o ke ma zî bewnê miletanê nê dinyay se kenê û ma zî nê miletan ra dersî bigirê. Beno ke no nûştişê ma zehf merdiman rê ecêb bêro. Dewijay û sükjey sero vinderdişê ma ney ra yeno. Eger xulam xulameya xo bizano û o wext sebebanê xulam biyin zî rind zano. Di dahfan dê zî şeno xo bireyino. Dişmenê ma yo gird nêzanayino. Ma do xo senî bireynê? Eger mileta ma heme (pêro) zanabo û o wext girwey ma rehat beno. Ma do raya zanayışî mileta xo rê akerê. Wê zahmetan ra tepiya rahmet û bereket yeno. Bêguman eger ma girwê xo bi dîşiplîna bikerê ke reyayişê ma rehet bo. Di nê wextî de, bêgirweyişa ma nêşenê xo bireynê. Ma do planê xo rindêr virazê û qandê mileta xo û mileta ma zî di dinya de cayê xo bigiro. Peyniya îxanetê çînyo. Kam mileta xo rê îxanet bikero û zey xîntano û ci rê ca çînyo. E, dewijay û sükjey sero ma vinderdiş. Reyayişê mileta ma zî, zey şima zanê, kes mileta xo rê îxanet nêkero. Mileta xo ra heskerdiş û welatê xo ra heskerdiş hedefê ci bo. Hewna ke wext esto ma pê rê wayir bivejiyê.

FERÎDÛNÊ GULİSTANÎ

Ihsan Kurt

Tel-fax: 41 21 652 76 07

Hollanda:

S. A. Fewzi

Tel-Fax: 31 10 48 555 43

Suriye:

Jana Seyda

Helim Yûsiv

Li Frankfûrtê deryaya Pirtûkan



Nivîskar, bi riya pirtûkên xwe xem û xeyalên xwe, ramanê xwe tîne zîmîn. Carinan bi awayekî edebî, carinan bi awayekî lekolînî rî nîşanî xwendevanên xwe dide. Yanî pirtûk ji bo gel tê nivîsandin û pêwîst e pirtûk bigihêjin ber destê gel. Ji bona vê yekê, li cihê navendî hin çalakî têne lidarxistin. Di van çalakiyan de pirtûkên nû têne nasandin, nivîskar û xwendevan hev dibînin û dina-sin

Yek ji van çalakiyan hefteya derbas-bûyi li Almanyayê li bajarê Frankfûrtê hate lidarxistin. Riya bi hezaran weşanxane û gelek nivîskaren bi nav û deng li Frankfûrtê bi Fûara Pirtûkan a Navneteweyî ya 50. ket. Ji romanen heya pirtûkên lêkolînî bi her cureyî pirtûk, li Frankfûrtê di deryaya pirtûkan de hatibûn ba hev û xwepêşandanek pêk hat.

Xelata weşankarîye dan Zarakolu

Di fûarê de Yekîtiya Weşankarên Navneteweyî yekemîn car xelat da û Ayşenur Zarakolu ku xwediya Weşanxanaya Belgeyê ye hêjayî xelatê hate dîtin. Mixabin dewleta tirk careke din asteng derxist û pasaport neda Zarakolu. Lê belê ev asteng bi ser neket û li şûna Ayşenur Zarakolu kurê wê Si-nan Zarakolu xelata diya xwe di 7'ê kewçêre de ji destê Serokê Yekîtiya Weşankarên Navneteweyî stand.

Ji bo xelatdayînê di salona fûarê de civînek hate lidarxistin. Ji gelek welatan nivîskar, weşankar û vezaretên çandê tevlî vê xelatdayînê bûn. Vekirîna civînê ji aliyê Serokê Yekîtiya We-

sankarên Navneteweyî ve hate kirin. Serokê Yekîtiya Weşankarên Navneteweyî di axaftina xwe de helwesta dewleta tirk ku nehişt Ayşenur Zarakolu were Almanyayê şermezár kir.

"Pirtûk hîn jî, têne şewitandin"

Pistî axaftina vekirînê Serokê Wezareta Çandê ya Franseyê Jack Lany, axaftinek kir. Lany, li ser qedexekirina pirtûkan sekinî û got: "Em ji bo azadiya gelek nivîskaran xebatan dîkin. Pirtûk li gelek ciyan hîn jî, têne şewitandin, hîn jî têne qedexekirin. Ev ji bo me şermeke mezin e. Divê tu kes jî bo dîtin û pirtûkên xwe neyê danizandin."

Serokê Wezareta Çandê yê Frensayê Jack Lany: "Em ji bo azadiya gelek nivîskaran xebatan dîkin. Pirtûk li gelek ciyan hîn jî, têne şewitandin, hîn jî têne qedexekirin. Ev ji bo me şermeke mezin e. Divê tu kes jî bo dîtin û pirtûkên xwe neyê danizandin."

Ismail Beşikçi ku ji bo berhemên xwâbi sedsalan ceza girtibû hebûn û vêba-la gelek biyaniyan jî, kişand.

"Li Tirkîyeyê weşanxaneyên weki me kêm in"

Xwediye Weşanxanaya Yurt Ünsal Öztürk, di fûarê de li ser rewşa weşanxaneyê Tirkîyeyê hin daxuyanî dan me. Öztürkê ku, nêzîkî hefteyekê Frankfûrtê ma, wiha axivî: "Li hemberî êrîşen dewleta tirk weşanxanaya mbi tengasiyên mezin re rû bi rû ye. Lebelê em li hemberî van erîşen dewletê hîn jî, kar û xebatê xwe berdewam di



nivîskar ji bo raman û pirtûkên xwe neyê darizandin. Wekî gelek cihan li Tirkîyeyê jî, hunermend, nivîskar û weşankar têne girtin û têne kuştin"

Her wiha bo Tirkîyeyê mînaka Ayşenur Zarakolu da û got: "Têkoşîna Zarakolu ji bo gelek nivîskar û weşankaran nimûneyek e. Di encama xebata Zarakolu de li Tirkîyeyê gelek çeper hatine şikandin û pirşirêka kurdan bi rihefi êdî tê zîmîn. Ji ber ku Zarakolu iro tevlî vê civînê nebû, em xembar in."

Li fûarê pirtûkên qedexekirin

Ji gelek welatan weşanxane tevlî vê fûarê bûn û di nav wan de Weşanxanaya Yurt jî, ku li Tirkîyeyê hatine qedexekirin hebû. Xwediye Weşanxanaya Yurt Ünsal Öztürk di standa ku bi des-tûra birêveberiya fûarê de vekiribû, pirtûkên ku li Tirkîyeyê hatine qedexekirin bi awayekî zincirkirî nîşan da. Di nav wan pirtûkan de bi giranî pirtûkên

kin. Li Tirkîyeyê gelek weşanxane pirtûkên ku dewletê û ideolojiya fermrexne dîkin, çap nakin. Hejmara weşanxaneyê weki me zehmetiyan dilşînî gelek kêm in. Em berxwedane mezin li hemberî qedexekirin û sansûkirin didin."

Li aliyê din di fûarê de Weşanxanaya Yurt, di standa xwe de cihda pirtûkên weki: "Keleya Elamut" û "Gulgûmêş" ku nû derxistine jî.